


# HELWEST

## Kovara Kulturî û Literaturî



Ez newgenbir ekim  
Hunermond im  
Zahmetkazek im  
Serê ked û  
Azadiye û  
Jiyaneke xwez  
didim...

Heya ku  
Noyê damezzandinê  
Ew Welat ên  
Birati û  
Heqî yê  
Dê Serê min  
Berdewan be!

Helwest - Hejmar / No : 11 - Payiz - 1998

HELWEST  
Kovara Kulturî û Lîteraturî

Xwedî û berpirsiyarê giştî  
*Lokman Polat*

Hejmar : 11

Sal : - Payiz - 1998

Çap : Baran Tryckerî

Abonefî : Salek - 150 Kr.

Derveyê Swêdê : 40 §

Postgîro : 9 13 31 - 9

ISSN - 1400 - 9404

Navnîşan / Adres  
Tensta Alle 43 - 2tr.  
163 64 Spanga - Sweden

Înternet E - Maîl  
Sertac - @ hotmail. Com

Pergala bergê û rûpelan :  
Helwest

*Wêneya Bergê*

Rewşenbîr  
( Wênevan - Adîl Duran )

Ji bilî nivîsên ku li ser navê  
Helwestê têñ weşandin, her  
nivîskarek berpirsiyarê  
nivîsa xwe ye.



ÇEND GOTIN

Xwendevanêñ Hêja!

Bi hejmara 11an ve em dîsan bi hevre ne. Me di berga vê hejmarê de guhar-tin çekir û em dixwazin ji niha pê ve hendî berga hemû hejmarêñ kovarê weha sade be û di berga her hejmarê de wêneyeke balkêş û xweşik hebe.

Ji alî naverokê ve kovara

Helwest dewlemendiya xwe didomîne. Ev hejmar jî wek hejmarêñ berê ji alî naveroka xwe ve dewlemend e. Heger îmkanêñ me yên aborî dest bide, ji alî kalîte ve jî em dê kovareke baş û bi kalîte derbixin.

Ji alî kalîte ve bergê hejmara 9an gelek baş bû, lê ya héjma-ra 10an nebaş bû. (Ji alî naverokê ve hejmara 10an baş e, bi naveroka xwe dewlemend e.) Ev ji ber sedemên aborî weha bû. Em dixwazin bergê kovara Helwestê bi şikleke nûh û hin baştır derbixin. Heger aboneyêñ kovarê pir bibin, em dê bikaribin kovareke ku ji alî kalîte ve gelek baş be derxin. Wek her hejmarî, di vê hejmarê de jî nivîsêñ balkêş hene. Em hêvî dîkin ku xwendevan bi dilşadî van nivîsan bixwînin. Kovara Helwest her ku biçe dê giranî bide ser danasîn, analîz û rexneyêñ edebî. Em dixwazin ku nivîskar û xwendevanêñ kovara Helwestê di vê babetê de, li ser van mijarêñ ku me bi nav kir, nivîs binivîsin û bişînin.

Di hejmarêñ pêşerojê de li ser jiyan û berhemên westayêñ edebiyata Kurdî em dê lêkolîn, nivîs biweşînin. Divê xwendevan û nivîskarêñ kovara Helwestê ji niha ve li ser wan binivîsin û nivîs û lêkolînen xwe ji kovara Helwestê re bişînin.

Li ser hunera romanê, şaxêñ herikandinêñ edebî û herweha li ser pîrs û pirsgirêkîñ edebî nivîs binivîsin û bişînin. Di hejmara bê de em giranî didin ser roman û trajedîyê, di romanê de trajedî çiye? Li ser vê em li benda nivîsêñ xwendevananin.

Em dixwazin di her hejmara Helwestê de nivîsêñ wergerê jî biweşînin. Ziman bi wergerê dewlemend dibe. Kesên wergervan nivîsêñ ku werdigerînin Kurdî - nivîsêñ kulturi, edebî- bila ji kovara Helwestê re bişînin, ku em biweşînin.

Em li benda dîtin û pêşniyazêñ xwendevanan in.

Di hejmara bê de, em dê çend nivîsêñ wergerê û li ser wergerê çend hevpeyvînen balkêş biweşînin.

Hetanî hejmara bê hûn bimînin di xweşiyê de.

# NAMEYÊN XWENDEVANAN



Gelek xwendevanê kovara Helwestê li ser hejmar 10an dîtinên xwe diyar kirin. Hinek ji wan weha dibêjin; "Em dizanin rewşa kovarê ya aborî ne baş e. Helbet heger Helwest bi reng derbiketana baştir bû, lê weha be jî tiştek nabe. Ji bo me naveroka kovarê, nivîsên di têde girîng in."

Hinek xwendevan û nivîskarê kovara Helwestê pêşniyaz dîkin ku kovara Helwest tenê bibe xwerû kovareke rexnegiriyê. Ew dixwazin ku bila bi piranî nivîsên rexnegiriyê têde bê weşandin.

Dîtina me jî ew e ku; Helwest bibe kovareke danasîn, analîz û rexneyê. Hinek Kurd hêj jî rexneyê baş fêm nekirine. Fêrê rexneya çêker, rexneya ku feydeyê bigihîne nivîskar û xwendevanan nebûne. Divê Kurd hendî dev ji hesûdiyê, ji rexneyên xirab berdin. Ji bo wê jî em ji nivîskar û xwendevanan daxwaz dîkin ku; nivîsên danasîn û analîza berhemên edebî, nivîsên rexnegirîya çêker ya li ser berhemên edebî binivîsin û ji kovara Helwestê re bişûnin.

Nivîsên ku gelek dirêj bin, em dê wek rêzenivîs di kovarê de biweşînin. Li ser pirs û problemên zimanê Kurdî, em dest bi rêzenivîsan dîkin û nivîsên li ser aloziya zimanê Kurdî di hejmara bê de diweşînin.

Rûpelên kovara Helwestê ji hemû nivîskarê Kurd re vekiriye. Em li benda nivîsên xwendevan û nivîskarê Kurd in.

## REXNEYÊN BI SEWIYE

Ez xwendevanevê kovara Helwestê me. Min kovara Helwest'ê hejmar 1 heta hejmar 5 bi zewq xwend. Ev cara pêşîn bû ku min dî di kovareke de bê kufur rexneyên edebî yên bi sekiye têne weşandin. Rexneyên weha çêker bikevin nav literatura Kurdî gelek baş e û gelek jî girîng e. Helanî niha li ser navê rexneyê kufur dihatin kirin, rexneyên çêker na, yên hesûdiyê dihatin kirin. Di rexneyên dilreşiyê de kufur wek haceteke dihat bi kar anîn. Bi ser navê rexneyê şexsiyeta hinek mirovan dihatin rendicekirin. Rexne şaş hatibû fêmkirin. Li gorî hinekan rexne tenê haceta xirabiyê bû.

Rewşenbîrên me berhemên hev na, li şexsiyetên hevûdu rexne digirtin. Li gorî helwestên ideolojîk û siyâşî rexneyan li hevûdu digirtin. Wexta ku min Helwestê xwend, min ferq kir ku Helwest di helwêsta rexnegiriyê de şopeke rast dimeşîne û metodên îlmî, zanîstî pêk tîne. Loma jî ez gihiştim vê qeneetê ku kovara Helwest ji pêşveçûnê re vekiriye û di vê şopa xwe ya rast de dê bi ser bikeve. Ez hêvî dikim ku kovara Helwest li ser xêza xwe ya zanîstî weşana xwe her bidomîne. Ez van dîtinên xwe yên di derbarê kovara Helwestê ji der û dora xwe re, ji nas û dostên xwe re jî dibêjim. Min hinek hejmarê kovara Helwestê ji yên ku bi edebîyatê re mijul dibin re şiyand. Ez bi dil û can dibin aboneyê kovara Helwestê û jê re jiyanekê dirêj a weşanê û serketin dixwazim.

Ferît Mîrhaj / Almanya

# NAMEYEKE GIRÎNG



Li ser guhertina şiklê kovara Helwest'ê ji me re nameyên nûh hatin. Di nameyên xwendevanan de dîtinên cuda hene. Hinek dibêjin kovar wek şiklê berî hîn baş bû, hinek jî dibêjin wek şiklê nûh baştir e.

Ji bo ku xwendevan eleqe nîşan didin û li ser kovara Helwest'ê difikirin û fîkrê xwe ji me re dibêjin, em gelek dilşad dibin. Hemû xwendevan dipejirînin ku ji alî estetîk ve şiklê nûh hîn baş e. Me ji Îstanbulê hinek nameyên xwendevanan wergirt. Xwendevanek dibêje: "Hejmara Helwestê ya dawîn (hejmar 9) kete destê min. Ji aliyê estetîkê ve na, lê ji aliyê na-verokê ve bi qasî hejmarên berê nayê.... Ez pê hesiyam ku Helwest radiwest e. Divê mihe-qeq Helwest weşana xwe bidomîne. Ez xwendevanekî Helwestê me ku bi rastî ez lêdigerim, li benda derketina hejmarên wê yêñ nûh im."

Xwendevanekî Helwest'ê ku bi eslê xwe ne Kurd e, lê bi Kurdî dikare bixwîne û binivîse, Forrest E. McMunn ji me re nameyeke gelek girîng şiyand. Ew di nameya xwe de weha dibêje: "Gelek spas ji bo nameya we û hejmara nehan a Helwest. Ez pir dilşa bûm gava min dît ku weşandina Helwest her berdewam e.

Mixabin hejmara heştan negihaye destê min; Heke Hûn kanibin hejmara heştan jî ji min re bişînin ezê gelek spasdar bim. Nîvisa we ya li ser girîgeha Amedê balkêş bû.

Herçî dîtinên min ên li ser şiklê nûh ê kovarê, bi rasî ez şiklê berê baştir dihesibînim, û ez hejmara pênc {ya boz} wekî ya herî spehî dibînim. Lê ez jî fam dikim ku şiklê nûh erzantîr dibe. Li hember asteng û dijwariyên belavkirina weşanên Kurdi, divê hemû weşangerên Kurd li reyên herî ekonomîk bigerin, heta ku hejmara xwendevanên xwe zêde bibin. Ji vê yekê ez biryara we ya ji bo şiklê nûh wekî bîryareke rast û di cî de dibînim.

Ez van ... pirtûkan sipariş dikim.

Di dawiyê de ez dixwazim bêjim ku ez çalakiyên we wekî gelekî giranbiha dinirxînim. Dibe ku xebatên çandî û edebî li gor bizavêni siyasi û têkoşîna çekdar hinekî li siyan dimînin, lê bi dîtina min nirxên çandî, wekî ziman û edebiyat, wê di wadeya dirêj de bingeha jiyana netewî ya gelê Kurd pêk bînin, û ji vê yekê çalakî û berhemên we ne tenê ji bo roja îroyîn, lê ji bo pêsedemê jî pir pir girîng in.

Bi hêviya serfîraziya we, ez silavêni herî germ dişînim.

Forrest E. McMunn  
Amerîkan Embassy / Australia

# KOVAR Ú XWENDEVAN

## Cîhan Dilşad


*D*i kar û xebata weşanvaniyê de ya herî girîng berdewambûna weşanê ye. Ji bo berdewambûna weşanê jî xwendevan pêwîst e. Heger xwendevan li weşanê xwedî dernekeve, nekire, nexwîne, nebe alîkar, ew weşan jiyana xwe ya weşanî nikare bidome.

*P*iştî salên 90î li Tirkîyê gelek kovarên baş derketin, lê nikaribûn jiyana xwe ya weşanî bidomînin. Yênu ku ji alî dewletê ve dihatin girtin, em li cihek bêlin, piraniya wan kovaran ji alî aborî ve qels diketin û piştî çend hejmaran dihatin girtin.

*L*i Ewropayê jî gelek kovarên Kurdan û yên Tirkan ji ber sedemên aborî nikaribûne weşana xwe bidomînin, loma jî weşana wan sekiniye. Weşanêni bi Tirkî û Kurdî hinek têne firotin, lê yên xwerû bi Kurdî li Ewropayê jî û li welêt jî hindik têne firotin.

*D*omandina weşana kovaran bi xwendevanan ve girêdayiye. Heger gelek aboneyên kovareke hebe, heger ew kovar baş bê belavkirin û firotin, ew kovar demek dûr û dirêj dikare weşana xwe bidomîne. Kovarên rêxistinêni siyasi umirdirêj in, lewra ji ber ku bi pereyêni rêxistinan, bi heqê en-

damtiya endaman têne derxistin. Lê kovarên ku ji alî komek mirovên rewşenbîr yên heweskar ve têne derxistin, temenê weşana wan kin e. Kovarên weha baş nayêñ belavkirin, nayêñ firotin, aboneyên wan hindikin, loma umirkin in.



Li Ewropayê bi sedhezaran Kurd hene, bi sedan komeleyên kulturî hene, lê çi heyfe ku vana nabin aboneyên kovarên Kurdi, van kovarên Kurdi narkerin û naxwînin. Yênu ku kovarên Kurdi derdixin di rûnê xwe de diqijin, bi zerarê kovarê derdixin û dikevin binê deynan. Ez dizanim gava ku hinek kes vê nivîsê bixwînin dê bibêjin "madem ku zirar dikin, dikevin binê deynan bila dernexin."

**K**ovar derxistin rîskek e. Heger hinek xwe nedin ber vê rîskê dê kovar dernekevin. Lê heger herkes ji vê rîskê bitirse û kovar dernexe, dê kî derbixe? Herkes bibêje; kovar derxistin zirar e, ez çima xwe bixim binê rîska deyndariyê, wê demê dê kovar dernekevin. Derketina kovarek xwerû bi Kurdî ji bo çand, edebiyat û zimanê Kurdî destketinek e netewayî ye.

Kovarê Kurdî bi fedakariya mirovên dilpak û welatperwer têñ weşandinê. Divê her Kurdê dilpak, welatparêz, qîmet û rûmetê bide kovarê ku xwerû bi Kurdî derdikevin. Mirovên welatperwer divê bibin aboneyên kovarê Kurdî.

**M**e gava dest bi meşana kovara Helwestê kire, me digot qey dê gelek kes bibin abone. Li holê gelek kurdperwer(!), pisporêñ zimanê Kurdî(!) Lêkolînvanêñ hessas(!) û gelek Kurdçî(!) hebûn. Me ji wan Kurdçîyan(!) û ji gelek kesan hêvî dikir ku dê miheqeq bibin abone, lê nebûn!....

**K**î nebû aboneyên kovara Helwestê? Ew kesên dilnepak, hesûd, dilreş, kurdçiyêñ sextekar, hinek nivîskarêñ zimandirêj, kesên nezan yên nîvrewşenbîr, yên ku xwe pîspor, zimanzan û lêkolînvan dihesibandin, nebûn aboneyê kovara Helwestê. Ew kesên ku di kovar û rojnameyêñ cuda de bi dehan, bi sedan, meqale dinivîsandin û pozbilindî dikirin nebûn aboneyê Helwestê. Ew kesên ku bi devoka Botan û ya Hekariyê sond dixwarin û li gorî wan Kurdîya rast tenê ew devoka wan a heremî bû, nebûn abone.

**E**vana nebûn abone, lê belê kî bû abone? Rewşenbîrêñ rasteqîn, edebiyatbezêñ bi dil û can, helbestvan, çîrokvan û romannivîserêñ jîr bûn abone. Xelq -gel- bi xwe bû abone. Kurdêñ nûhgihaştî, yên ku hewes û entreseya wan ji zanîna çand û edebiyata Kurdî re hebûn bûn

abone. Lêkolînerêñ biyanî ku fêrî Kurdî bûbûn, bûn abone. Hinek dostêñ gelê Kurd ku bi dil û can fêrê zimanê Kurdî bûne û bi dilxweşî kovarêñ Kurdî dixwînin, Alman, Amerîkî, Swîsrî, Holandî bûn abone.

**HELWEST**

Avala & Kultur & Literatur

**Kovara Kulturi û Literaturi**

**ZİNDANA AMEDE**



Me dema dest bi weşana kovara Helwestê kir û me hejmara yekem derxist, me vê hejmara yekem ji gelek Kurdan re bê pere -belaş- şiyand. Me di nameyek de jî diyar kir ku yên ku bibin abone re hejmara duyem û hejmarêñ din dê bêne şiyandin. Yên ku nebin abone re nayêñ şiyandin. Hinek bûn abone, hinek nebûn abone. Ev tiştek normal e. Lê ya anormal ew bu ku; mirovek dilreş, hesûd, bê edebî kir û kovarê -hejmara yekem- li me paşve vegerand. Yanê kovarê ji me re paşve şiyand. Bextreşî kir, dilreşî û hesûdiya xwe da nîşandan. Bila nebana abone û hew. Ci pêwîst dikir ku kovarê paşve bişîne. Gelek kes nebûn abone, lê ji wan kesekî kovarê ji me re paşve neşiyand. Kesek vê bêedebiyê nekir.

Me wexta ku dest bi kovara Helwestê kir, gelek kes bi şik û guman bun ku dê Helwest çend hejmar derkeve û bisekine, weşana wê raweste. Lê Helwest nesekiniya. Ew rêveçûna xwe didomîne. Meşa wê ya weşanî hetanî ku li Tirkîyê kovarek bi naverok û çapa xwe bedew be, kovarek wek Helwestê kulturî û lîteraturî derbikeve, dê Helwest jiyanâ xwe ya weşanê bidomîne. Dema ku kovarek kulturî û Lîteraturî li Stenbolê derket û Helwestê jî pêwîst dît alîkariya wê kovarê bike û Helwest xwe di nav kar û xebata wê kovarê de bibîne, wê demê dê Helwest weşana xwe bide rawestandin û alîkariya wê kovarê bike.

# TÊGEHÊN ÇAND Û HUNERÊ

Xidirê Üso

Kovara Helwest di hejmara xwe ya duyem de, di derbarê çand û huner de gengeşyek ve-kiribû. Loma ez jî dixwazim di vê mijarê de dîtinê xwe bêjim.

Di derbarê çandê de, daxwiyanîyên ku di Helwestê de hatinin kirin li gorî min jî ne şas in û lênerîna Marx wek bingeha wan tê xwiy-akirin. "Çand, li hemberî afirandinê xwezayî, hemû afirandinê mirovan e."

Gava ku em vê lênerînê hinekî bi firehî vekin; çand di warê aborî, sîyasî, hunerî, filozofî, huquqî, zanyarî û hwd hemû afirandinê civakê yên dîrokî ne.

Gava ku Marx, bi azîna materyalîzma dîrokî, analîza qanûnê avahîyên civakî dike, jêdera çandê avahîya bingehîn rê dide û wê mîna endamekî avahîya jor dinirxîne. Ji bo ku sazûmanek civakî bê guhertin û yek nû ava bibe, divê ku avahîya bingehîn ya kevn bê guhertin, her guhertina avahîya bingehîn, bi

xwe re avahîya jor ya kevn diguherîne, lê dewsa wê yeke li gorî xwe ji nû de ava dike.



Li gorî vê analîza Marx ya zanyarîya cîvakî, bi guhertina sazûmana civakî re çand jî tê guher-tin an li gorî berjewendîyên serwerên sazûmanê tê reformkirin. Wê gavê em dikaniн bêjin her sazûman xwedîyê çandek "cûda" an guherandî ye. Lê divê neyê ji bîrkirin, her çandek nû (bûyî) di malzikê çanda kevn de zîl dide.

**H**er neteweyek xwedîyê pêvajoya jîyanek dîrokî, civakî û aborîyek teybetî û cûda ye; loma teybetî û cûdahîya çanda wê, ji yên neteweyên din heye. Mîna ku têgeha “netewe” ku bi serwerîya sazûmana şermîyandarîyê re derketîye holê, her sazûman, li gorî pêşveçûn, guhertin û pêdivîyêne xwe têgehêne xwe jî di berhimîne. Gava ku em behsa çanda navnetewî bikin; ew çanda ku li cîhanê herî pêş de ketîye, an ku tesîrê li her kesî dike û pêwîstîya her cîvakê pê heye.

Huner, hêza afirandina berhema estetîkî ye. Qewimîn û bûyerên li xwezayê û civakê têñ holê, ku li ser mirovan bandûrek dîyar dikan, her mirovekî ku bi pîsporî û bîrbirinek teybetî vana bi kompozîsyonek afirandêrî şîrove bike û bineqşîne, ku bi wê kompozîsyonê ji nû de li ser hîs û ramanêni mirovan bandûrek teybetî rê bide, ji vêna re berhemek hunerî tê gotin.

**W**eke ku ji wateya wê jî tê zanîn çand, têgehek gelempêrî ya hemû berhemên civakî yên dîrokî, sazûmanî, ramyarî û zanyarî, aborî û hunermendî ye. Têgeha çandê, tenê komek (grûp - birr) tiştên layî hev îfade nake, gelek komên ji hev cuda û dûrî hev îfade dike.

Huner, her çiqas pêwendîyê wê bi kom û mijarêni din re hebe jî, bêtir teybetî, şexsî û ramyarî ye. Têgeha hunerê, tenê birrek tiştên tayê hev îfade dike. Mîna wêje, wêne, peyker, folklor û hwd.

**M**eriv nikani çandê mîna darekî û huner jî mîna şaxek darê rê bide. Encax meriv kani çandê mîna daristanek ji gelek birrêne cûrbecûr daran pêk hatîye, huner jî di wê daristanê de darekê, komek darêne ji yek sinifî pêk hatîye rê bide.

**L**i ser rûpela Helwestê, “Kovara Çand û Edebîyata Kurdi” tê nivîsandin. Mîna ku çawa huner endamekî çandê be, wêje jî endamekî huner e. Eger ji bo huner endamekî çandê ye, loma ne pêwîst e ku bi gotina çandê re bê bi karanîn, ez jî dibêm ku ev lînêrîn rast be, wê gavê ji bo ku wêje endamekî huner e, divê ne pêwîst be gotina wêje jî bê nivîsandin; tenê deynin “Kovara Çanda Kurdi”

Li gorî min, heger li ser felsefe, zanîstî, dîrok, zimanزانî û mijarêni mîna vana neyê rawestan, ne pêwîst e ku gotina “Kulturê” jî bê nivîsandin. “Wêje” tenê bes e. Na, ji dervî wêje, wê behsa mijarêni huner yên din bêñ kirin, divê gotina “Huner” jî bê nivîsandin.

**Lokman Polat**

**KULTUR**

**Ü**


**LITERATUR**

**Derdikeve!**

**Helwest  
Çanda Nûjen**

Helbestvan, Nivîskar û Rojnamevanê Kurd

# Orhan Kotan Wefat Kir



Orhan

Helbestvan, Nivîskar û Rojnamevanê Kurd Orhan Kotan çû ser heqîya xwe. Wî di 9ê tirmeha 1998ê de li Stockholmê wefat kir. Orhan Kotan di sala 1944an de di dayik bû. Dibistana bilind xwend. Di nav tevgera rizgarîwaz a Kurdistanê de kar û xebatên siyâsî kir. Ew di dema salên 80î û 90î de wek teorîsyeneke Marksîst nivîsên siyâsî yên teorîk nivîsî.

Orhan Kotan li gel siyaseyvaniya xwe helbestvan bu jî. Wî sê pirtûkên helbestan weşand. Dengbêj Ahmed Kaya şîrîn wî kire kelam û stiriya, ji ber şîrîn wî kaseteke stranê derxist.

Orhan Kotan di hêla rojnamevaniye de jî xebateke hêja kir e. Wî pêşî "Weşanxaneya Komal" di sala 1975ê de vekir. Weşanên Komalê liser çand û dîroka Kurdan pirtûkên hêja weşand. Di sala 1976an de wî û hevalên xwe kovara "Rizgarî" weşandin. Orhan Kotan pişî ku derket derveyê welêt, li Swêdê kovara "Yekîti" û paşê jî rojnameya "Kurdistan Press" weşand. Ew pişî ku vege riya Tirkîyê, li wir rojnameya "Realîte Press" derxist. Kovara Helwest ji bo wefata Orhan Kotan xemgîniya xwe diyar dike û ji malbata wî re ser saxiyê dixwaze. Ji bo bîranîna wî, em li jêr helbe steke wî diweşînin.

di van ciyan de nîr  
li stûyê stranê me yên hennekirî hatin xistin  
bi navê biratiya gelan

Ev demek e ez wek neferekî têkoşîna netewî û civakî ya li wełatê xwe, ji bo bicihanîna erkên xwe di kefteleftê de me. Li ser vî bingehî her kirinek, her helwestek, her fikra ku ketiye ser kaxezê ji bo min wek perçeyên des tanake mezin in.

di van ciyan de zikên jinê biducanî hatin qelişandin  
di van ciyan de îstîklala tam hat felisandin  
lê lûle hê sar nebûbûn  
rizgarîwazên millî dimeşîyan  
pê li serên bi xwîn yên zarokan dikirin  
û dimeşîyan rixgarîwazên millî  
ji bo qelliamên millî

.....  
nanê me tunebû  
guleyên me tunebû  
axa me  
ku me bi hezaran can  
û hêviyekê li serê diçand  
tunebû  
miriyên me wekî ciyan li ser hev vegevizîn  
û namûsa me di bin lingan de ma

.....  
Ew bi çaketên xwe yên çerm  
û bi poşnên xwe yên reş  
ordiyên talanker nebûn  
ew neferên kuvayî mulîye bûn  
ku me bi hevre nanê reş  
seriye kî pîvaz parve dikir  
û cendekên me, bi şîn û bê civat, li nik hev dihatin  
veşartin  
cendîrme, pijangên bi xwîn yên zor û zulmê  
Zîlanê bi xwîn rê nade  
ji hal û hewalê fahm nake  
wey lo, lo, lo, wey lo  
li pey me alayıya siwarî / li ser me makînali

# DI EDEBIYATÊ DE MOTÎFÊN SIYASÎ

Lokman Polat

Edebiyat haceteke ku ji rizgariya  
netewî re dibe alîkar.


G. Plehanov

Divê di edebiyatê de motîfên siyasî hebe. Têgihiştina edebiyata rizgariya neteweyî bê geş kirin. Li cihanê, di gelek welatên ku kolonî ne, yan jî girêdayî emperyalîzmê ne, enîyên netewayê têt avakirin. Di gel van enîyên neteweyî yên siyasî, enîyên çand, huner û edebiyatê jî têne sazkirin. Pêkanîna enîya êçandî, edebî ji bo têkoşîna rizgariya neteweyî lezahîye, pêngav e. Di demên çûyi de li welatên Asya, afrîka û Latîn amerikayê têkoşîneke şoresserî pêk hat û ev têkoşîn û şerê şoresserî ji bo pêşveçûna edebiyata rizgariyê zemînek mezin pêkanî. Li ser vê zemîna şoresserî, edebiyata rizgariyê gul veda. Şerê rizgariya gelê Kurd jî ji bo edebiyatê zemînek bêhempa ye. Hacet û malzemeyên edebiyatê herî pir li Kurdistanê heye. Ji bo edebiyatê mijar gelek in û nivîskar dikarin van mijarên cure cure ji bo afirandina berhemên edebî wek ham madeyê pêk bînin û li ser van mijar û bûyerên balkêş edebiyatek dewlemend biafrînin. Gelek berhemên edebî yên ku aîdê gelên din in, ham madeya wan berheman ji Kurdistanê ye. Li ci heyfe ku nivîskarên Kurd vê ham madeya ku li Kurdistanê heye nikarin ji bo berhemên xwe pêk bînin.

Heftê sale ku di sê perçeyên Kurdistanê de şerê partîzanî, şerê pêşmergeyetî, şerê gerîlatî heye. Li ser vê şerê rizgariya neteweyî hêj jî berhemeke baş, têkûz nehatiye afirandin. Nivîskarên Kurd li ser şer û têkoşîna siyasî û çekdarî ya gelê Kurd kor û lal in. Divê roman, çîrok û helbesta şerê rizgariyê bê nivîsin. Divê edebiyata rizgariya neteweyî bê afirandin. Û di edebiyata rizgariyê de divê motîfên xurt yên siyasî hebe. Nivîskarek heger ji gelê xwe cuda be, li doza gelê xwe xwedî dernekeve, daxwazên gelê xwe neynê zimên, li ser derd, kul, eş û elemên gelê xwe berhemên edebî neafrîne, ew ji bo gelê xwe, ji bo civakê nikare edebiyateke civakî biafrîne. Nikare edebiyata gelê xwe pêşve bixe û dewle-mend bike. Pêwîstiya gelê Kurd bi edebiyata civakî, bi edebiyata rizgariyê heye. Di dema me de edebiyata ji bo edebiyatê tu feydeyek ji gelê Kurd re naynê. Nivîskarên Kurd di nav rûpelên berhemên xwe yê edebî de divê mihe-qeq motîfên siyasî bi kar bînin. Divê edebiyata Kurdî ya ku îro têt afirandin li ser bingeha siyasî, li gorî rewşa gelê Kurd muhtevayek siyasî û edebî pêk bîne.

Çîrokên ku min hetanî niha nivîsiye bi piranî çîrokên ku bi muhteva xwe siyasî ne. Li ser bûyerên siyasî hatine hunandin. Di her çîrokek de ji bo civakê mesajek siyasî heye.

Heger mirov ji bo civakê eserên edebî biafrîne, divê mirov di berhemên xwe yên edebî de bûyerên siyasî binexşîne. 300 sal berê westayê edebiyata Kurdî Ahmedê Xanî di berhemâ xwe ya nemir "Mem û Zîn"ê de motifên siyasî pêk aniye. Mesajên siyasî û civakî pêşkêşê gelê Kurd kiriye. James Joyce di pirtûka xwe ya bi navê "Yên Dublîni" de jîyan û têkoşîna gelê xwe anîye zimên. Pirsa doza rizgariya Irlandayê kiriye mijara berhemâ xwe.



Di van demên dawîn de hinek nivîskarêne Kurd vê rastiyê dîtin û berhemên ku behsa dema me dike, berhemên ku rewşa gelê me radixe ber çavan, berhemên ku behsa şer û têkoşîna gelê Kurd dike afirandin. Romana Mehmed Uzun, "Tarî mîna mirinê, Evîn mîna ronyîê", romana Munzur Çem "Ekmeïi de yaktilar" û berhemâ min (Lokman Polat) a dawîn "Ey Şehîd, Hey Hebûn" berhemên edebî yên rizgariyê ne. Hinek rewşenbîrên Kurd yên ku di hefs û zindanê de ne; her wekî Şamîl Batmaz, Ali oruç û yên din jî -her çiqas bi tirkî be jî- berhemên edebî a rizgariya netewayî diafirînin.

Berhemên min; di hemû pirtûkên min de dîmenek ji şer û têkoşîna gelê Kurd heye. Lehengên çîrokên min bi piranî însanên welaçparêz û şoreşger in. Gelekî wan jî egêtênu ku ji bo rizgariya welaç xwe û azadiya gelê xwe canê xwe kirine feda, mîrxasên jîr in. Ez di berhemên xwe de êş, kul û keder û zehmetiyêwan însanên militan, fedekarî û cesûriya wan mirovên mîrxas tînim zimên. Ez dizanîm mirovên weha çiqas zehmetî dibînin û çiqas fedekarî dikin.

Nîha navê wî nayê bîra min, nivîskarekî Tirk digot : "Ez ji ber bûyerereke biçûk ku di rojnameyan de derdikeve, dikarim çîrokek binivîsim. Wê bûyera piçûk a di rojnameyê de bi zimanekî edebî dikim çîrok û diafirînim." Ez jî carna eynê weha dikim. Bûyerên ku di rojnameyên Kurdan de derdikevin, bi zimanê edebî dinivîsim û wek çîrokek diafirînim. Gelek caran serpêhatiya însanên Kurd bi şcweyeke edebî dinivîsim. Waqayê civakî bi motifên siyasî dihonim. Hinek kesen mîrxas hene ku bi şer û têkoşîna xwe di nav gel de bûne efsanewî. Jîyan û têkoşîna wan mirovên efsanewî ji bo afirandina berhemên edebî dewlemendiyek e. Ez serpêhatiyêwan kesen efsanevî ji nav edebiyata devkî derdixim û dikim nav edebiyata nivîskî. Ruhê edebî didim pê, bûyerê bi usluba edebî şîrove dikim, li gor metodên edebî, çîrok yan jî serpêhatiyê li hevûdu dihûnim û bi vê şêweyê debiyata nivîskî hîn pirtir dewlemend dikim.

Ev rastiya Kurdan e ku; pirtûkên Kurdî zêde nayêñ xwendin. Xwendevanên weşanên Kurdî gelek hindik in. Ji bo ku gelek kes pirtûkên Kurdî naxwînin, ji naveroka wan pirtûkên Kurdî jî hayidar nînin. Min bi navê "Jin û Zindan" pirtûkeke kurteçîrokan weşand. Min wê pirtûkê îthafê jînen Kurd û bi taybetî jî îthafê du keçen Kurd ku bedena xwe, laşê xwe di pîrbahiya Newrozê de şewitandin re îthaf kiribû. Çîrokên ku di pirtûka min de hatibûn weşandinê çîrokên jîyan û têkoşîna jin û keçen militan, keçen

gerîla yên serê çiyan bûn. Gelo vê pirtûka min çend keç û jinê Kurd xwendin? Li ser vê pirtûkê çima tu keçikek, tu jinek tiştek negot, tiştek nenivîsand? Masmediya Kurdan a bi Tirkî -kovar û rojnameyên Tirkofonan-yeğ rêzek jî nivîs li ser vê pirtûkê nenivîsandin. Halbûkî di wê pirtûkê de ji bo azadiya jinan mesajên siyasî hebû. Di wê pirtûkê de di şexsiyeta jinan de rewşa civakî ya Kurdistanê hebû. Di pirtûkê de têkoşîna jina Kurd hebû. Lê ji bo ku pirtûk bi Kurdî bû, nehate xwendin, eleqe nedît, intrese nehat nîşandan. Heger min wê pirtûka li ser jinan bi Kurdî na, lê bi Tirkî binivîsana belkî bi sedan nivîsên danasîn, analîz û nirxandinê dê bihatana weşandin. Lê wê gavê jî ev pirtûka min nedibû aîdê edebiyata Kurdî. Ü tiştekî din; heger ez bi Tirkî bifikiriyama û min pirtûkê bi Tirkî binivîsana, min dê ewqas baş nenivîsiyana. Bi Kurdî fikrandin û nivîsandin, bi Kurdî hîskirin haz û rengeke cuda dide çîrokên Kurdî.

Lokman POLAT

## JIN Û ZÎNDAN



Berhemên min yên din jî neynika civaka Kurd in, panoramaya berxwedana li dij tehda û zilmê ye, helwêsta rengê têkoşeriye ne. Lê çi heyf ku; ji bo ku bi Kurdî hatine nivîsin nayêñ xwendin. Min bi tirkî pirtûkeke kurteçirokan nivîsand û weşand. Navê pirtûkê "Barbar Kasîrgas" bû. Ev pirtûk hêj jî ji pirtûkên min yên Kurdî pirtir tê firotin. Niha min dest bi nivîsîna romanek kiriye. Ez

romanê bi Kurdî dinivîsînim. Navê romanê "Kewa Marî" ye. Heger min vê romanê bi Tirkî binivîsandana û navê wê jî daniyana "Marî Keklîpîm" belkî bibana bestseler. Ev jî sedemên xwe yên dîrokî û civakî heye. Rewşa civaka Kurd, hal û weziyata kurdan weha ye.

*M*in pirtûkek bi navê "Mêrxas - serpêhatiyêñ Kurdî" weşand. Li ser vê pirtûkê di rojnameya "Özgür Politika" yê de nivîsek danasînê derket. Piştî wê nivîsê intrese û eleqederek mezin ji bo pirtûkê hate nîşandan. Pêwendî û eleqeyek baş derket holê. Ev jî girîngiya danasîna pirtûkan di rojnameyêñ Kurdan de dide xuyakirin. Bi rastî jî gelek girîng e ku rojnameyêñ rojane û yên hefteyî li ser berhemên edebî yên bi Kurdî nivîsên danasînê binivîsin. Loma jî divê hemû rojname û kovarêñ Kurdî li ser berhemên edebî yên Kurdî (berhema kîjan nivîskar dibe bila bibe) nivîsên danasînê û yên analîz ê biweşînin.

*L*ê xuya ye ku hêj jî hinek kovarêñ Kurdî kerr û lalitiya xwe didomînin. Kovara Avaşîn şes hejmar derketiye di tu hejmareke xwe de behsa tu berhemeke edebî nake. Kovara Jiyana Rewşen, War, Zend û hinek din jî weha ne. Ew jî kor in, kerr in, lal in. Di nav rûpelên xwe de cîh nadîn danasîna berheman, li ser berhemên edebî analîz naweşînin. Kovarê çandî, edebî divê ji bo berhemên edebî vatîniyêñ xwe bînin cîh, bêdeng nemînin. Di vê hêlê de yê ku herî baş wezîfeyêñ xwe haniye cîh, kovara helwest e. Kovara Helwest bi raman û nêrîna di edebiyatê de analîz û rexne pêşveçûyine hareket kir û bi vê nêrînê dest bi weşana xwe kir. Kovara Helwestê li gorî fikrê munaqeşe edebiyatê kûr dike, geş dike weşana xwe domand. Kovara Helwest'ê, di pêvajoya jiyana xwe ya weşanî de, mîsyonek baş anî cîh.

*Têbinî* : Min vê nivîsê di sala 1997'an de nivîsî. Lê ji ber sedemên teknîkî min nivîsê hetanî niha li tu ciheke, di tu weşanek de neweşand. Ev cara yekeme ku ez di kovara Helwest'ê de diweşînim.

# BÎYANÎBÛN Û AZADÎ

Nivîs : Cemal Ozçelîk - Wergêr : Xidirê Üso



Bîyanîbûn, tevlî ku di serî de bi awakî herî vekirî di pêvajoya hilberînê de çêdibe, divê nê gûmankirin ku tenê bi vê qadê ve girêdayî dimîne. Awayê hilberînê û rewşa mirovan ya di pêvajoya hilberînê de, tevlî ku awayê pêkanîna jîyana wan ya di hemû waran de şanî dide, di vê pêvajoyê de xwe rîdana bîyanîbûnê, di hemû warên jîyanê yên din jî xwe rî dide.

Di civakek ku pêvajoya bîyanîbûnê dijî, mîna ku her tişt serberjîr bisikine, berevacî dibe; hîlekarî mîna serfîrazîyê, tirsonekî mîna zîrekî û zordarî mîna mîrxasîyê tê dîtin.

Di serê her tiştî de pragmatîzm (fîydekarî) û pêvana serfîrazîyê tê danîn. Yekî ku serfîraz be, wê gavê "mafedar" e jî. Ev serfîrazî ku li ser bêehlaqîyê ava bûbe jî, yên serfîraz têncîpikkirin û bi ser de di civakê de dibe "xwedîyê bawerî û rûmetê". Lewra "mirov bi bahozan re têkildar nabin, ew dinêrin ku wê keştiya xwe bigehînin delav an na".

## Di Heskirinê De Biyanîbûn

Biyanîbûn, ma di peywendîyên "heskirinê" yên ku di warê jiyana me de cihê herî bi rûmet distîne, nayê jîyîn? Mirov di bijartinên xwe de ji "hebûn" bêtir "xwedî bûnîyê" bibijêre; yekî hemberî wî jî ci şêwe bahozan dijî bêtir binêre ku keştiya xwe digehîne delav an na û ji dêvla ku di asasê mirovî de li keysa ku xwe ji nû de biafirîne bigere, berî her tiştî pêşeroja xwe têxin garantîyê, ma ne bîyanîbûn bi xwe ye?

Lêbelê divê heskirin bi heskirin bê pîvan. Heskirin, encax bi heskirinê bê bersîvandin. Lê heskirin herdem hemberê xwe nabîne; gava heskirin heskirinê çêneke, di demê de dibe dilgirêdanek yekalî û her ku diçe bi xwe re dikeve biyanîbûnê. Wekê ku kesê hesdike, girêdan û îdealên di xwe de xwedî dike, derbasî yê hemberî xwe dike û di dawîn de dikeve xapînoka ku ev teybêtîna ne di wî de, di yê hemberî wî de pêde dibe.

Kesê ku hemû taybetîyên xwe yên delal û bedew derbasî yê hemberî xwe bike, êdî wê xwe bêrûmet û bê wate bibîne. Ji bo vê rewşê derbas bike jî dixwaze bigehîje "ewê" her şewe sipehîtyê di xwe de xwedî dike û ku "pê" re bibe yek wê têkeve xapînoka ku ewê jî bibe xwedîyê wan taybetîyan lê na... gehîştina wî/wê bê îmkan e. Ew nayê gehîştin û çiqas ew neyê gehîştin jî bilindtir dibe û dibe îlah/îlahe.



Loma yekî ji rûmetên ku bi derbaskirina yekî din re winda kiriye hatiye qetandin, li hemberî xwe û heskirina xwe dikeve biyanîbûnê. Bawerîya bi xwe winda dike û li hemberî hemû warên jîyanê yên din jî dikeve hundir sarîyekê, dilgesîya jîyanê winda dike. Êdî ji bo wî jîyan vala ye...

### **Biyanîbûna Netewî**

Warên ku biyanîbûn lê tê jîyîn di serî de yek jê jî biyanîbûna li hemberî rûmetên netewî û netewîtîyê ye. Biyanîbûna netewî, di asasê înkara rûmetên netewî an weke ku bi dûrketa jî van rûmetan bi şewekî ne xwedîderketina wan tê jîyîn; di bin navê xwedîderketina rûmetên netewî, tahrîpkirina wan an di warnî gelek teng tê hep-skirin û bi şeweya qetandina ji girêdanê xwe yên organîk ku bi rûmetên gerdûnî ve girêdayî tê jîyîn.

"Neteweperestî" yek ku bi rûmetên madî û manewî yên mirovahîyê afirandîye, bala xwe nede rêça geşbûnîya hemdemî ku gelê cîhanê tê de dimeşe, wê çiqasî kanibe netewa me ji vê çarçova teng xilas bike? Hela hela rûmetên gerdûnî li alîkî bihêle, heta rûmetên netewî jî ne bi tevayî, hinek hêlêwan tenê bingeh bê girtin, ji bo pêvajoya geşbûnîya netewî wê fêdak çawa bibe?

Bi armanca bidestxistina pîvanên gerdûnî, rûmetên netewî yên pîralî bingeh bêngirtin, ji bo bîyanîbûna netewî jî holê rabe wê rolekî girîng bistîne. Lê divê neyê ji bîrkirin ku netewe rizgar nebe, bîyanîbûna netewî jî bi tûmî jî holê ranabe...

Ji xwe di vê xalê de hinek rêxistinêni ji bo rizgarîya netewî têkoşînê didin. Ji faydên netewî yên gelemerî bêtir, bi sedema bingehgirtina faydên xwe yên grûbî yên teng tê dîtin ku pêvajoya bîyanîbûn û alozîbûnekê tê jîyîn.

Ji ber sedemên erdnîgarî, sîyasî, mezhebî û zaravêna cuda û hwd. ku rewşa welatê me ya bi sedsalan hatîye parçekirin û dabeşkirin, berpirsiyârên gelê me yên sîyasî, carcaran ji nakokîyên navbêna dewletên neyar fêde kiriye û berê xwe dane sîyaseta tifaqîyê. Ev rewşek e tê gehîştin. Lê ku ev lênerîn bibe sîyasetek kronîk, gava bi xwe re li hemberî hêza xwe ya esasî bê bawerîyê bîne û dîsa ev şewe tifaqî li gorî pêwendî û faydên rêxistinêni bi cûre yên yekalî bêngirtin, di têkoşîna netewî de birînen bêderman vedike. Îro ji alîkî dibêñ em ji dewletên din fêde bikin, ji alîyê din jî xetera ku ji sîyaseten wan yên bi dizî û dûrûdirêjî li ser herêmê, bibin dûvik tê jîyîn.

Ku yekîtiya netewî çenebe û ev yekîti li ser bawerîya bi hêza xwe sîyasetek netewî di demek herî kurt de nexe jîyanê, pêvajoya helandin û aloziya rûmet û destkeftîyên netewî bihêztir dike.

## Trajedîya Rewşenbîr û Bîyanîbûn

Di bîyanîbûnê de xaleke berbiçav ya din jî, beşek rewşenbîrê Kurd ku ne hindik, hîna jî bin psîkolojîya “rewşenbîriya kolonî” derneketine. Ev tîpa rewşenbîr, di hundir hîsek xwe kêm dibîne de, di halê rûhîyetek ku nikane vekirî li rûmetên xwe yên netewî xwedî derê û mîna mafênu ku gelên din xwedî ne, gelê xwe ji wî maflî re layiq nabîne.

Rewşike giyanî ku mîna vêna ya berbeçav jî, di şanîdana otosansorê de derdikeve holê. Hinek nivîskar - rewşenbîr, gava ku li dervî welat an bi navekî cûda dinivîsin hinek lênrînê xwe vekirî (carna jî bi awakî lêzêdekirin û ajîtarîf) tînin zimê; gava bi nav û nîşan dertêñ holê, ji dêbla ku bibêñ “ez vêna diramim, ji bo netewa xwe vêna dixwazim”, “baqîlî”, “taktîk”, “giranîti” dibe sitarî ji wan re.

Li welitekî ku bi hezaran mirovîn me jîyana xwe winda kiriye, bi hezaran gund hatiye şewitandin û rûxandin, bi milyonan mirov ji cîh û warêñ xwe hatiye qewimandin, birçî û perîşan li ber dîwaran mane, ku rewşenbîr mafê tayinkirina çarenûsa netewa xwe vekirî neparêze, ku nebêje ger neteweşyên din xwedîyê ci maflî ne divê netewa min jî xwedîyê yek maflî be, ma dikanin mîsyona rewşenbîriyê pêk bînin? Di nav refêñ rewşenbîrê Kurd yên ku bi dehsalan têkoşînê didin, çima Îsmaîl Beşîkçî'nî nû dernayêñ?

Lêbelê ev rewş tenê bi tirsonektîya rewşenbîrêñ me nayê ifadekirin. Ji dêbla ku civaka me, di rewşenbîrêñ xwe bigehîje û li wan xwedî derê, bi piranî wan biçûk dibîne û di rewşen dijwar de dikeve meylek ku wan bitenê bihêle. Di encama vê helwesta neyêñ de, rewşenbîr li hemberî civakê, civak li hemberî rewşenbîr û hemberî xwe dikeve hundir bîyanîbûnekê û li hemberî êrisêñ serweran yên li hemberî beşekê, beşeke din vêna pêrsgirêka xwe nabîne û bêdeng dimîne.

Hela hela di pêvajonî dîrokî - civakî yên belû de, tevlî ku ketin cûdahîya nakokîyêñ ku hebûn, di rewşen ku ji bo van nakokîyana çareser bibe, mercen objektîf yên pêwîst ku hîna nestewîyaye, rewşa ku rewşenbîr ketinê ji bo wan tam bûye trajedîyek.

Evana di warê felsefî - ramanî, etîk, estetîk û heta di warê olî de teorîyên mezîn an li gorî pîvana gesbûyîna civaka xwe, tevlî ku ramanîn berbipêş têñ hesêp geş kîrin, dema ronakbîrîyê ya ku wan daye destpêkirin, bi piranî ji alê civakê ve nehatîye pejîrandin û bi ser de jî li hemberî derketinê bi hêrs ev mirovana avêtine dûrê jîyana civakê û bûye sedema ku ew bi çarenûsa xwe re bi tenê bimîne. Ev xaleke girîng e ku divê meriv li ser raweste, ev şêwe ronakxwaz di serî de mîna “dîhn” an “serserîyan” têñ bi navkirin û sermezarkirin.

Endamê Akademîya Zanyarîyan ya Yekîtiya Sovyeta Kevn Yûrî Davîdov li ser vê mijarê welê dibê: “Çarenûsa wî qirnî trajîk bû. Nakokîyêñ xwe serveyâî kiriye, mirov jî anîne rewşek ku jîyanek din dixwazin. Ci mixabin, hêzêñ civakî yên vê jîyana nû ku tê behskirin ava bike nehatine afîrandin. Qirnekî welê, berîya ku basik bide mirovan (bêşik mirovîn wê demê yên pêşverû) gelekkî berê wan hînî firê bikin... nakokîya di navbêna îdealêñ mirovîn pêşverû û alîyê wan yê “reel”, dîtinbar û “bişerm” de û nakokîya objektîf ya di gesbûnîya rastîya madî de, ji şanîdana di “warê mirovi” û pê ve ne tiştekî din e.” Y. Davîdov

Ji alîkî de ev trajedîya giş di derbasbûna pêvajonî dîyar ku civakêñ li hemberî kesen ronakbîr çawa ketine hundir bîyanîbûnê şanî dide, wê demê, piştî xalekê û pê ve rewşenbîr jî li hemberî negucherandina rastîye neçar dimîne û dudilîyê dijî. “Mirovîn welê, tişte ku dixwazin bibin û ku jîyanek din dijîn, bêbirîyâya di navbêna ku ne mirovîn sibê, lê yên iro ne, dijîn.” Y. Davîdov.

bi

## Têmûrê Xelîl re

Naveroka çend hejmarêñ kovara we, ku min, wek dibêjin, ber çavê xwe ra derbaz kirin, wek navê kovarê ciwan e... Tiştek ber çava ye, ku her cûre xwendevan dikare tê da - di kovara Helwestê de - nivîsa gor dilê xwe bibîne.

*Kovara Helwest-Pirs: Te kengê, çawan û çima dest bi nivîsinê kir? Tu ji bo çi û ji kî ra dinivîsi?*


*Têmûrê Xelîl :* Rast e, min hinek serpêhatî nivîsîne, pirtûka min ya bi sernivîsara "Evîna wî hişyar bû" ji bo çapê amade ye, lê ez xwe nivîskar nahesibînim. Karê min yê sereke rojnamevanî ye.

Min di xortanîya xwe da dest bi nivîsarê kirîye. Ez di maleke ronakbîrêñ kurda da mezin bûme. Bavê min 24 salan serokatîya radyo ya kurdî ya Yêrîvanê kirîye. Min ji nivîsarêñ bavê xwe gelek feyda dît. Anglo dibistan mala me bû, mamosta jî bavê min bû. Min zû fêm kir, ku gelê min hewcê xwendin û nivîsara kurdî ye, ji ber wê jî nivîsi.

*Kovara Helwest-Pirs: Tu dikarî bi kurtî behsa kar û xebata xwe bikî?*

*Têmûrê Xelîl :* Ez 17 salan di rojnama kurdî ya Riya Teze da bûme serokê para çande, 3 sala wek berpirsiyar radyo ya kurdî da xebitîme, 3 sala jî gundê kurda - Sîpanê da (li Ermenîstanê) mamoştatî kirîye. Heta niha min belkî zêdeyî 300 miqale nivîsîne, pirê wan ji kovar û rojnamêñ kurdî yên Awropayê û Kurdistanê ra. Min herwaha pirtûka kurdzan, profêsor M. Hasratyan "Kurdên Tirkîyayê di dema nuh û ya herî nuh da" ji rûsî wergerandîye kurdî û Enstîtuya Brûksêlê berî çend salan çap kir. Min pêşgotina dîwana Cegerxwîn ya 8-a "Aştî" nivîsi ye û h. w.d.

*Kovara Helwest-Pirs: Tu rewşa edebîyata Kurdî ya nivîskî çawan dibîni? Başî û kêmanî çi ne û ji bo çêtirkirinê çi divê?*



■ Têmûrê XELİL

*Têmûrê Xelîl :* Başî ew e, ku edebîyata kurdî ya nivîskî zêde li Kurdistanâ İraqê û Sovyetistana berê, xwesma li Ermenîstanê pêş ketîye. Kêmanî jî ew e, ku ew edebîyat heta niha jî pir kêm gihîştiye kurdên Kurdistanâ Bakûr. Hetanî niha jî "Folklo-ra kurmanca", ku Heçîyê Cindî û Emînê Evdal sala 1936-a li Yêrîvanê bi kurdîya tîpêñ latînî bi 700 rûpelî çap kirine, ne gihîştiye perçê Kurdistanâ mezin. Ü pirtûkên usa gelek hene. Ji bo edebîyata me çêtir be, ya sereke ew nîne, ku pirtûk pir bin. Ya giring başbûna wan e.

*Kovara Helwest-Pirs: Nasnameya berhemekê zimanê wê ye, yan naveroka wê ye?*

*Têmûrê Xelîl :* Nasnemeya berhemekê him zimanê wê ye, him naveroka wê ye, him jî kurde-warîya wê ye. Bes nîne, ku nivîskar kurd be, an jî kurdî baş zanibe. Gelek cara helbesta da her tişt heye, bilî poêziyayê, miqalekê da her tişt heye, bilî rojnamevanîyê. Gerekê xwendevan ji nivîsarê feydake usa hilde, ku bi sala kêrî wê bê û her bîranînekê ra lezetê jê bibîne.

*Kovara Helwest-Pirs: Romana kurdî çawan dikare pêş bikeve?*

*Têmûrê Xelîl :* Ji bo nivîsara romana kurdî nivîskar gerekê xwedîyê xwendineke profesyonal be, kolorît û timtêla kurdî baş zanibe, romanen nivîskarê cîhanê yên bi nav û deng xwendibe û feyda jê hildabe. Tolstoyê mezin gava "Ceng û Aşîti" nivîsiye, heta dawî anîye, çend çewal ji nivîsarên xwe qelaştiye, avîfîye û car din nivîsiye. Romanîvîsarên me pirî caran bi nivîsarên xwe him navê xwe diêxin, him jî navê gelê me. Lê dîsa jî çirûskên nivîsara romana baş bal kurda idî zîl didin.

*Kovara Helwest-Pirs: Tu berhemên nivîskarê kurd yên nuh (yên ku xwerû bi kurdî dinivîsinin) çawan dinirxînî?*

*Têmûrê Xelîl :* Min heta niha romaneye kurdî heta dawî nikaribûye bixwînim. Eger gelek baş bûna, minê berdewam bikira. Lê ew nayê wê manê, ku ne baş in. Ez hîvîdar im, ku baştıribin. Hinek ji wan ji orte bilindit in jî, lê dil çêtir dixweze. Alîkî va jî lome li romanîvîsarên me nayê kîrinê. Kal-bava mîratek baş wî alî da ne hîstîne, ku wan ra bibe tradîsyon. Lê vê rewşa romana kurdî da, dîsa jî pêşerojeke geş xuya dibe.

*Kovara Helwest-Pirs: Tu berhemên kîjan nivîskarê cîhanê û yên kurdan hez dikî, kî tesîra xwe li ser te kirîye û kîjanî nêzî xwe dibîni?*

*Têmûrê Xelîl :* Ji nivîskarê cîhanê T. Drayzê, L. Tolstoy, G. Markê, S. Golsûorsî, M. Mittçêl, ji yên kurda jî Kemal Burkay, Keremê Reş û Yilmaz Guney nêzîkî dilê min in. Wana tesîreke mezin li ser min kirine û ez ji wana fêr bûm, ku nivîskarî ne karê her kesî ye.

*Kovara Helwest-Pirs: Tu niha li ser çi dixebeitî? Planen te yên pêşerojê çi ne?*

*Têmûrê Xelîl :* Ez niha piranî gotara dînîvisim û fêri karanîna kompyûtêrê(Datayê) dibim. Bira bi we ecêb neyê, ku li welatê me kompyûtêra her kesî tune. Heya ya rîdaksyonâ Riya Teze jî tune. Van şertan da rojnamevan, helbestvan û nivîskarêne me karê ku kirine beramberî mîrânîyê ye. Alîkîva jî, hazır dibim pirtûkê kurdzanen bi nav û deng ji Rûsî û Ermenî wergerînime kurdî. Hîvîdar im ku hin weşanxane xwe bidin ber vi karî.

*Kovara Helwest-Pirs: Ji bo pêşveçûna çand, edebiyat û zimanê kurdî rola kovarene xwerû bi kurdî çi ye?*

*Têmûrê Xelîl :* Gelekî mezin e. Lê ez dibînim, ku pir kêm mirov kovara da dînîvisin. Karê çapkirina pirtûkêne xwe ser karê ji bo bi seda xwendevanen kovarene ra dibînin. Ew kesê, ku çend sala rojnamevanî xwendibe û miqalek nenivîsibe, ew ne rojnamevan e. Wek yekî 7 sala doxtorî xwendibe û hîç emelîyetek ne kiribe. Carna jî kovar rola xwe ya bê tereşîfîye baş bi cîh naynin. İro usa bûye, ku têkûzkirina naverok, zimanê kovare jîmara xwendevanen wê belkî gelekî zêde neke, ji ber ku komikî, piştgirîya filan an bêvan hêzê, dubendîyen nav şexsan da hela kokbir ne bûne. Kovar gerekê ya milet be û bona milet be.

*Kovara Helwest-Pirs: Pirsa me ya dawî jî ev e: Ji bo kovara Helweste dîtin û pêşniyarene te çi ne? Kovara Helwest giranî bide ser kîjan babeti?*

*Têmûrê Xelîl :* Naveroka çend hejmarêne kovara we, ku min, wek dibêjin, ber çavê xwe ra derbaz kîrin, wek navê kovare ciwan e. Nivîsarên, ku min çend hejmarêne wê da xwendin, têr nakin, ku ez bîr-bawerîyen xwe derheqa kovare da tam bêjim. Lê tiştik ber çava ye, ku her cûre xwendevan dikare tê da - di kovara Helweste de - nivîsa gor dilê xwe bibîne.

*Kovara Helwest: Ji bo bersîvîn te em sipas dîkin. Rûpelên kovara Helweste her tim ji te ra vekirîne.*

*Têmûrê Xelîl :* Gelek sipas. Eger kovarek rûpelên wê geleka ra vekirî bin, ew ê pêş bikeve. Ji xwe daxwaza me hemûyan jî ew e.

# EVÎNDAR BUYÎNÊ RE ŞADIMANÎ Û HESTÊN DIJWAR DIVÊ



Adil Duran

Bêguman jiyan çawa hatiye jiyan, wisan tê jiyandin.! Mirov jixwe hezneke û jihalê xwe razî nebe ev ne mirov e. Jiyan divê bêarmanc be û mirov lipê be! Evin tişteke, hezkirin tişteke din e. Divê lece yê jiyanê de evin: di jiyana mirov de yekcarî dibe, lê hezkirin pir ali ye her tim dibe û bêhezkirinê his û ramanên mirov devlemend û aso yê mirov ve dibe.

Dema berê mewzû û mijûlbun wek roja iroyin ne bû. Mirov jiber sedemên nezani bûnê lêhember livin û tevgera Dinî bê çare bûbûn. Jixwe bêxwere çarean digerian. Yen ku hin tiştan re çare dîtibûn û hin pirsgirêk bersivandibûn, omrê wanen têr nekir, nakokiyên wî demî jipêşerojê re hiştin. Nûvedan û dozkirinên wanen jime re ma!

Em dinav civateke girtî de mezin bûn. Têkiliyên me yên şexsî ne azad in. Bêtaybeti bandur a pirrengi û kevneşopi ya pêşenayên me digel hin tabûyên din hê di

jiyana me de giring in. Çaxa ku meriv pirsa evin di çerçeva Oli de biversivinê hin qalip derdikevin peş ew jî, ev in: "suç""guneh""şerm" ûhwd. nizm ditinek heye. Bixwe milk a Xwedî ye, mîr qulên xwedê ne û jin jî milkê mîran in! Her wisan libaweriya Oli jiyan liser çewtiyeke ava bûye.



Ligor raya min şexseki xwe hêja diti ango Ni-jadek hêja nîn e. Mirov bixwe çavkaniya qenci û xerabiyê ye. Civateke pêşketî dinav xwe de xerabiyê winda dike. Ciwata dewle-mend (kapitalist) her xerabiyê pêda dike da ku berjewandiya xwe biparêze.

Jiber wan sedemên jorin û hin pir sedemên din merivîn ku dinav civata girtî de radibin rastiyê nabêjin. Xêr û gunehêن xwe vedîşêrinin. Tirsonek pesnê xwe didin. Dilreşî, hesûdî, xérnexwezi û derew dibe karê wan a rojane. Demdemî ya wan jidayîk bûyînê dest pê dike heya roja mirinê. His û daxwezên xwe di hundurî xwe de didewisînin , dildizî yêن xwe nadin der. Hin tiştên ecêb dikin û bixwe re dibin û tu kes pê nizane ku jişaşitiya wan rasti yê, ji rasti ya wan jî, ji şasiti yê jihev derîne...



Ez ji evinê pê da bûm e û ji jiyana min ya sitemkêş û hesret dagirti lihev şabûn û hezkirinê dest pê dike. Xisusiyetek ji eve, tiştên ku min diti bû û jiyam ji jiyana min dirêjtir e. Ew rûbirû bi evin û şoreşî re têne honandin.

Wek herkesi, her welatparêzî ez, welatê xwe hezdikim. Lê mixabin lidûr ve dinihêrim. Nikarim hestêن dilê bibêjim. Evin a giran e ya min. Û di dilê min de evin rizgar nebûye û ez ne azad im. Her cure yê Kullikan, her taxlid yê heywan an dihebinim. Bişadimani û hestêن dijwar mirovan hez dikim. Xerab ji xerabêن min in, jisedem a xerabiyêن wan fêrî qenci yê bûm. Ma ne ecêb e, tiştên ku nayîn hezkirin ez wanana jî hez dikim.

Ma şewat a dilê Ferhad û Şêrînê, a Mem û Zin ê ci ye? Ew derewşin. Demê ku meriv kûr û dûr lî dinihêrî tev bi mijarêن serdestan ya beg û mîran in. Lê heya ku welat bindest û dagirker be û jin milkê mîran be evîniyek azad nabe! Jiber ku evindari tişteke, hezkirin jî tişteke din e.

Em jinav girse yêن kedkar yêن sitemkêşde rabûne. Ji ali kî xizani û ji ali yê din de jî nezanî ketiye para me. Dewletêن dagirker yên heri wahş û hov dest danine ser hestêن me yêن mirovî, nahêlin ku bihpakiyêن me jimirinê , ji işûjanan, ji hesretê rizgar bin. Jibo wê evîn a giran em têن raçavkirin, têن girtin, têن kuştin û têne koçewarkirin, lê disa jî ew nikarin wê hest, dilgeşî, hezkirin, hêvî, hesret û evîna dilê me bikujin. Jiber ku em bêşadimani û hestêن dijwar jiyanê ve girêdayi ne. Jibo me jiyan lecek e..

# DI ÇANDA GELÊ KURD DE KEVNEŞOPIYA DAWET Û ŞAHÎYA ZEWACÊ

## Xidir Egît

Li Kurdistanê, dawet û dîlan, bi gelempêrî ji bo zewacê (marê), sunet û kirîvanîyê û li hevhatina (aşitiya) dijminahî û dozêñ xwînê tê li darxistin.

Li Berîya Mêrdînê, ji bo ku malbatek lawê xwe bi-zewicîne, pêşî qasidekî dişîne mala namzeta bûkê. Qasid, daxwaza malbata namzetê zavê, ya danîna mervanîya pevgirêdana jin û mérän, ji malxuyê malê re vedike. Malxwê jî, bi kevanî, ferdên malê an lêzimên xwe dişêwîre û raya wan distîne. Heger tu asteng tunebe û bi erênîya herkesî be, bersîvek erênî dide.

Roja ku wê xwazgînî biçin xwestina bûkê, him mala bûkê û him jî ya zavê hazirîya xwe dikin. Mala bûkê, li gor karinî û hejmara xwazgînîya mîh, berx an eylok û mirîşkan şerjê dikin û xwarina xwe amade dikin. Bûk jî, berî bîst -sî saltî, paç û kirâsê bi hûçik û mîntan, lê anîha kincen hîn sade û modern li xwe dike, çi xemlî û xêza wê yê heye, bi ser bejna xwe de berdide; bi misk, kil û amber, an lewento, parfum û makyaજ xwe dixemlîne û li bendî xwazgînîya radiweste.

Zava jî xwe kur dike, xwe dişo û vedişo, taximek cil li bejîn û bala xwe dike, bi dê, bav û mirovén xwe yên zîrek û çavnas re berê xwe dide mala bûkê.

Piştî silav û xêrhatinî xwazgînî rûdinên. Pêşî bi xwestina namzelê zave ya avê re, namzeta bûkê, jê re avê tîne. Piştre bûk jî xwazgînîyan re, li ser tepsiyeke berê çay, piştre qehwê tîne, yek bi yek li ber wan digerîne. Hemû xwazgînî baş bala xwe didin devûrû, bejnûbal, kêsîm û fesal û birêveçûna bûkê. Ne tenê çavdêriya bûkê, her weha ya mal û malbata bûkê jî dikin. Li hundir xênî dinêrin, bi pirs û galegalan, di derbarê hev de agahdar dibin. Pişî xwarinê dîsa namzeta bûkê, çayê li ber xwazgînîya digerîne. Berî ku daxwaz û bîryara xwe ji malxwê re bêjin, mala zavê wî derdixin der, raya wî distînin. Xwazgînî jî qûlîsa çedîkin û di nav xwe de dişêwîrin, ger ku hemfîkir bin û bersîva wan erênî be, daxwaza mervantî û zewaca ciwanên xwe û wan dîyar dikin, na neyêni be, dibêñ em'ê biçin, piştre ji we re bîryara xwe bişînin.

Berîya bi deh-panze sala û wê de, berdêlî an bi qelen zewicandin di giranîyê de bû, lê îro rewş hinekî haşîye guhertin. Bi taybelî pêşveçûna tevgera Kurd ya netewî û besdariya jinêñ Kurd ya têkoşîn û şoreşê bandûrek mezin li ser rewşa kevneşopîya civaka Kurd ya zewacê kiriye. Belkî hinekî bandûra guhertina têkilîyên aborî jî heye. Êdî daxwaza qîz û xorstan bêtir li ber çav tê girtin. Gava ku keç û kur hev biecibînin û dil bidin hev,

êdî tiştên din pir nabin asteng. Êdî mîna bazara firotona pez û dewaran bê kirîn, kes nema dixwaze bi qelen keçen xwe bifiroşin. Loma îro bi giranî malbata bûkê, ji ya zavê re dibê:

— Kara keça me, bi dilê wê bike û wê siwar bikin!

Lê ev daxwaz, barekî giran dide ser mala zavê. Mala bûkê, ji mala zavê dixwazin ku ji bûkê re zér, xanî û hemû alavê malekê, mîna paldank (qoltix), sarker, cilço, tv, seta muzîkê, firne, taximê mobîlya û hwd. bikirin. Lê rewşa mala zavê ya madî nebaş be, van mesrefena kêm dikin, an li hev par dikin.

Berî bi bîst-sî salî û wê de, malênu ku rewşa wan baş ba, hîn di dema qîzanîyê de ji keçê xwe re ciyêz amade dikirin: li gorî karînîya xwe zér dikirin, kulavêncemî, bedlek-duda nivîn, ber, xalîçe, merş, ferd çê dikirin û gava bûk bihata zeyiyê, nogînek (çelekek) an çend mîh û bizin didanê. Lê qîz biçuya mîr, ji hemû mal û milkê mala bavê xwe bêpar dima. Anîha jî kes mîrata bavê xwe ji birê xwe naşîne. Û vêna li gorî qanûnê eşîri wek şermezarîyekê dibîne.

Gava ku du malbat keçen xwe bi berdêlî didin hev, herkes wek hev kara keça xwe dikin. Ev zewaca ya herî bêmesref e. Lê gelek caran bavekî çel-pêncî salî-60-70 jî dibe-, keça xwe dike berdêlya xwe û keça çardeh-panzdeh salî ji xwe re lîne û ya xwe jî dide yekî mîna xwe. Lê îro keça ku naxwaze ji dêbla kalekî bike, diçe gerîla.

Lê gava qelen bê birîn, kara bûkê li mala bavê wê dikeve. Bavê bûkê li gorî ûjdanê xwe, ci ji kîza xwe re bikire-nekire ew dizane. Mala zavê tevlî qelen, kara cizî badide, xelata ap û xweha bûkê didin, ji bûkê re jî paçê misî, mîntanê çuxan siwêdî bi qeytan û kirasek yan jî dêbla wan pere didin bûkê. Mala bûkê jî ji zavê re bedlekî disfînin. Pişî xwestina bûkê, şerbet û nîşanîya bûk û zavê çê dikin. Nîşan li mala bûkê tê çekirin. Lêzimên bûk û zavê tev têñ vexwendin. Mala zavê, tiştên xwarinê dîbin li mala bûkê, ji berbûyan re xwarinê çê dikin. Di vê navbênenê de jî berbû, li ber bilûr,

erbane, keman, çê (rebab), saz an def û zurnê govendê digirin û dîlanê dikin. Ji xeynê def û zurnê, li ber hemû ensturmanê din dîlok û stranê cûrbecûr têñ gotin. Gelek dema jî, li hundir dengbêj distirêñ.



Pişî ku berbû xwarina xwe dixwin, bûk û zave li ba hev didin rûnişandin. Birê zavê, li ser tepsiyeke du hingulîskê (gustîlîn zér) bi herdu hêlêne qurdêlekê ve girêdayî û du kasikê şerbetê tîne. Birê zavê gulîskê wan dixe tilîyen wan, qurdêlê bi meqesê jê dike, bûk û zavê herkê qurtékê li şerbeta xwe dixin û kasikê xwe bi hev diguhêrin û şerbeta xwe vedixwin. Wê gavê berbû jî dest bi vexwarina şerbetê dikin. Wê gavê sêniyek fereh datînin; ji bûk û zavê re berbû ci xelat anîbin, yek bi yek dîyarî ya xwe datînin ser sêniyê; yek jî li ber diraweste û kê ci anîbe, bi dengê bilind navê wî/wê kesî û dîyarîya wan dide nasîn. Hinek zér û pere, hinek kinc, qumas û sol, hin jî pere didin. Tenê pere para zavê, yên din tev para bûkê ne. Dawî herkes diçe mala xwe.

Berê ku herin bûkê suwar bikin, li gorî karînîya mala zavê, hevteyek an du roj; berbûyan vexwendî dikin, dest bi dawet û şahîyê dikin. Hetanî salêñ heştêyî (1980), bi aletekî an duda govend û dîlan li dar dixistin, lê pişî 80'yan êdî bi ensturmanê modern û bi komên muzîkê govendant digerînin.

Li herêma me, berî bi sîçel salî, jin û mér bi giranî cilên otanîk û netewî li xwe dikirin. Keç û jinan paçêni misrî û çitare, kirâsên hûcik û delîngên dirêj û fereh, bi xetên rengîn û mîtan li xwe dikirin. Qîzan tenê hibrîyên Helebî û Mûsilî, jinan kitän û hibrî, pîrejinan şahrîn Kesrewanî didan serê xwe. Yêñ xisil û zêr, dêmik (eyûn) û hîvik (hîlal), gerden, bazin, guhar, zincîr û xirxal li xwe dikir in. Pişten rîs yên bi gulizên rengîn didan nava xwe. Mêran hinek simalîn melkezêt, egal û fîstan, hinan şerwel, qutik û îşlik li xwe dikirin û diketin dawet û dîlanê. Mîna îro ji, wê demê keç û xort, jin û mér, pîrejin û kal, bêasteng diketin destêne hev û bi hevre govend digerandin. Ci hunerên qîz û xortan hebû, di govend û dîlanê de rê dida. Loma gelek xort û qîz, di wan govend û dîlanan de dihat eci-bandin û dilênen wan diket hev û dibûn dînar û evîndarênen hev. Lê îro ew cilên gelêri, dewsâ xwe ji cilên nîvmodern an modern re hîşfîye. Lê dawet û dîlan her berdewam e.



Bi gelempêri dîlana giranî û delîlo tê lîstin. Tevî van lîstikana bişaro, qimlo, gîzo, bablekan û çarpîne ji tê lîstin.

Carina di nîvê govendê de, bav, dê, kal, pîrik, xweh, xaltik an metika zavê bi tena xwe direqise.

Rojek berî suwarkirina bûkê, hinek berbû li mala zavê mesefek hine çedîkin û diciñ mala bûkê. Mûma dikin nav hinê, jin û qîz li dora bûkê direqî-

sin, dîlok û strana dibêñ, dilîrînin û li çepika dixin. Berbû dixwazin destê bûkê hine bikin, lê pêşî ji bo xelata hinê bûk destê xwe venake, gava ku zêrekî dixin kefa destê bûkê, bûk destûra hinekirinê dide. Piştre, berbû ji mala bûk re dibêñ; "em sibê di felan saetê têñ siwarkirina bûkê!".

Di saeta ku biryar dane, dema berê bi hespan, lê îro bi texsîyan berê xwe didin mala bûkê. Ku bi berdêlî be, li cîhekî di navbêna herdu malbatan, bûkan bi hev diguherin.

Berî ku berbû bêñ, bûk xwe dişo û vedişo, bi alîkarîya çend jinêni ji mala zavê ji têñ, paç û kiras, mîtan, xişl û zêren wê lê dikin û wê dixe-milînin. Mala bavê bûkê, pere dixin binê sola wê û dikin pîyê wê. Ci bîhnêñ xweş heye, bi bûkê werdikin. Ebak (pelerînek) şîfon, (bi giranî ji rengê sor, şîn û şîrikî-mor) davêñ ser serê wê û xêlîyek tenik ya mor davêjin ser ruyê wê. Lê îro ev kevneşopî ji hatîye guhertin. Edî bûk, bûkanî (gelînlik) ya sipî û modern li xwe dikin.

Berbû li mala bûkê govendê digerînin. Mala zavê, xilata apê bûkê debançakê didin. Xweha bûkê ji xelata ser sindoqa bûkê distîne û azep karek an perê wê disfînin û piştre bûka xwe di navbêna du jinan de suwar dikin. Wê gavê malbat û gundîyên bûkê, arvan davêñ ser berbûran û ji paşyê de bi dizî, buşkilin darvekirî bi berbûya ven dikin. Berbûvanî gava bi rê dikevin, jin tev bi yek dengî dilîrînin û mér çekêñ xwe berjor dikin û diteqînin. Hinek berbû ji divêñ:

— Me da we kapeka salkê, me bir kevanîya malekê!

Hin berbûvanî ji bi sirtan dibêñ:

— Bavê bûkê kerê quto, li paş xanîya gu dikuto!

— Bavê bûkê kuçikê soro, li paş xanîya xwe dike kuloro!

Wê gavê mala bûkê bi hêrs xwe li erdê dixin û ji wan re xeber û dujûna didin.

Lê gava berî bûkê suwar bikin, bi taybeñî ji berbû dixwazin tiştekî bêqîmet ji mala bûkê bidizin. Loma mala bûkê li her tişte xwe miqateye. Ew tişte dizîye çiqas bêinx be ji, gava mala bûkê lê hayî bibe, bi mîsogerî wê tişte xwe ji wan bistîne. Lê ku nebînin, wî tişî li mala zavê li ber lingê bûkê (me te ji mîna vî tişî dizîye, an em ji mala bavê te jêhaftîr û çavvekirîtir in) dişikînî!



Mala bûkê, ji bo çavdêrî û payitandina keçanîya bûkê, jînek jêhaftî bi qîza xwe re dişîne mala zavê.

Dema bûk tê ber derî, heta ku dîyarîya xwe negire, danakeve. Mala zavê heneka bi bûkê dîkin û jê re dibên:

— Me beranekî şor daye te, ma hîn tu ci ji me dixwazî.

Piştre kî pere bide bûkê, ku bûk razî nebe danakeve; ji jin ku pêre hatiye daxwaza bûkê dipirsin û wê razî dîkin û dadixin.

Zavê li ser xêni, li jora deriyê ku bûk wê tê re derbas bibe diraweste. Dîya zavê, şerbikekî ku şekir tê de dide destê bûkê, ew ji li ser xêni, kevirê hûr, şekir û perê hûr davêje ser serê bûkê. Bûkê derbasî hundir dîkin. Pişî bûkê didin rûniştandin, jin xwe di berhev radikin ku sola bûkê derxin û perê di solê de, mîna xelata bûkê ji xwe re bigirin. Pişî deranîna solê, pitikek pêçayî bi teybeñî kur didin himêza bûkê, bûk xelatê dixe ber pêçeka

pitikê; ji bo ku berê wê yên pêşîn kur be. Xortek ji pênuş an saeta zavê dibin ji bûkê re, bûk xelata wî ji dide. Kevanîya ku xwarîna dawetê çedike, hesk û text dibe ji bûkê re, bûk dîyarîya wê ji dide. Ev dîyarî û adetna giş, wateyêwan yên mîstîk, eşîrî û serwerîya mîr ya li ser jinê heye.

Mala zavê, ji bo berbûya ji sibê de haziriya nanê dawetê dike. Li gorî hejmara berbûyan, mala zavê li gorî karinîya xwe berx, mîh, an nogin (çêlek) şerjê dîkin, birinc, burxur [savar] û tişikê çedîkin. Berbû rûdinênan xwe dixwin, mala zavê, ji qumaş, gomlek û goran xelatê vexwendîyan dide wan û wan birêdîkin. Gava berbû bela dibe tev dibên:

— Dawet ferikî, berbû hetikî!

Wê gavê berber tînin dest bi kurkirina zavê dike. Heval û cîranê zavê, ji bo berbir peran bi berdilkî ser sîngâ zavê vedîkin.

Êvarî mele tînin û mara bûk û zavê dibirin; hin ji diçin beledîyê mara xwe ya fermî dibirin.

Hevalzave (saxdiç - azabaşî - NH.), ji zavê û bûkê re xwarin û cerezan amade dike û zave di derbarê zewacê de agahdar dike û şîreta li zavê dike.

Dibe sibeh, mala zavê xwarinê çedîkin, bangî jin û pîrejinêncîrana dîkin, ji bo ser rûsipîfîya bûkê. Kevnê keçanîyê yê bi xwîn rê jinan dide; jin ji heryek dîyarîyekê dide bûkê; bûk ji destmalekê û coteke gore dide mîvanan.



# NIVÎSKARÊN KURD ÇI DINIVÎSIN Û ÇI DIXWÎNIN?

- 1 -

## Kovara Helwest

Me di vê hejmarê de dosyeke biçûk amade kir e. Mijara dosyayê li ser "Nivîskarên Kurd çi dinivîsin û çi dixwînin" e. Me xwest ku em bi xwendevanen bidin zanîn ku nivîskarên Kurd li ser van tiştan dixebeitin, nivîs dinivîsin û van pirtûkan dixwînin.

Me çerçeveya dosyayê di vê hejmarê de bi nivîskarên Kurd yên ku li Swêdê dijîn sînor kir e. Li welêt û li Ewropayê gelek nivîskarên Kurd hene, di hejmara bê de jî, em dê bersîvên wan biweşînin. Nivîskarên Kurd yên ku li Swêdê dijîn hemû di nav vê dosyeyê de cîh negirtine. Hinek ji ber sedemên teknîkî û hwd. em nikaribûn wan bibînin. Loma jî hemû nivîskarên Kurd di vê dosyeyê de cîh negirtine. Heger em xwe bigîşînin wan, bersîvên wan jî em di hejmara bê de diweşînin. Ev lêpirsîna me di hejmara bê de jî didome. Nivîskarên Kurd yên li Ewrûpa, li Tirkiyê û yên li welêt bila li gorî pirsên jorîn bersîvên xwe binivîsin û ji me re bişînin da ku em biweşînin.

Kovara Helwest ji wan nivîskarên Kurd yên ku bersîva pirsên me dane re gelek spas dike ku pirsên me bersivandin. Pirsa ku me ji wan kir

tenê pirsa "Hûn niha çi dinivîsinin û çi dixwînin?" e. Em vê dosyaya biçûk bi dilxweşî pêşkêşê xwendevanen kovara Helwestê dikan.

Kovara Helwest

## Bersîvên Kovara Helwestê

### Mehmed Uzun

Ez niha sê nivîskarên ku ji hevûdu gelekî cihê ne, parelelî hev, dixwînim. Thomas Mann, Tonî Morrison û Julien Gracq. Herweha ez hin kitabênu ku li ser van nivîskaran hatine nivîsin jî dixwînim.

Ev çendêne dawîn min du kitabênu Mann "Dinle Alman Ulusu" û "Frihetens problem" (Problemê azadiyê) û du kitabênu ku li ser Mann hatine nivîsin, "Thomas Mann och det tredje riket" (T. Mann û cumhuriyeta siyemîn), Olle Holmberg, "Thomas Mann Josef och hans bröder" (T. Mann Yusif û birayê Yusif), Olle Holmberg, xwendin. Mann, yek ji nivîskarên herî girîng ê sedsala me ye û di warê romanê de jî gavênu avêtine. Jiber vê yekê meriv divê hertim Mann bixwîne.

Ji T. Morrison ji min romanên wê "Jazz" û "Siegli" û eserên wê "Mörk spel" (Listika Reş) xwendin. Morrison, nivîskareke reşik a amerikayê ye û ew di romanên xwe de her çela reşikan û serenacamên wan dike. Rewşa reşikên amerikayê yên sedsala 19 û destpêka 20'an bi rewşa kurdên Tirkîye dişibe. Ji vî alî ve ji Morrison girîng e.

Ji J. Gracq, min romana wî ya sereke "Le Rivage des Syrtes" (Qiraqên çemê Sîrteyê) û "Argol Şatosunda" xwendin. Di warê zimanê edebî û li-hevhanîna edebiyateke bedew de Gracq girîng e.

### Tu niha çi dînîvîsî?

Kovareke ewrûpayî ku bi heft zimanân tê weşandin, *Lettre International* ji min eserek li ser mijara "Liberating the future from the past? - Liberating the past from the futur?" xwestiye. Ez niha, bi qewlê soranan, xerîkî vê nivîsarê me.

### Têmûrê Xelîl

**Çi dînîvîsim :** Eva weke 10 sala zêdetir e dixwazim pirtûkeke xwe ya serpêhatiya çap bikim, lê her sal guhartina dikime navê û her sal ji dibêjim "çiqas baş bû min sala par ne da çapê". Awa here, belkî gelek dereng, an ji qet çap nebe.

Lê karê sereke, ku ez dikim, ew piranî werger in. Pirtûkên zanyarî yên profesorên bi nav û deng li ser dîroka Kurdî, ku bi sala li Sovyetistana berê bi zimanên Rusî û Ermenî çap bûne, bere - bere werdigerînim Kurdî.

### Çi dîxwînim:

Pirtûkên Kurdî wisa zêde bûne, ku êdî mirov dikare hilbijartînê bike. Eger romana evînîyê be û ji jiyana Kurda nebe, yekser naxwînim, ji ber ku dewsâ wan dikarim romanên biyanîyan yên bi nav û deng bixwînim. Piranî wan pirtûka dixwînim, ku di hêla ziman da dikarim tiştekî jê feyda bikim û yek ji ewê, kubihna folklorâ me jê tê.

Edebîyata herî baş bona min ew e, dema babetê nivîsê yê ser dereca bilind bi Kurdeyatîya va tê hûnandin.

### Cemal Batun

#### Pirtûka ku ez niha dixwînim:

Ez pirtûkeke bi zimanê Bulgarî dixwînim, pirtûk bi navê "Nêrîna Demokrat" e û ji alî gelek pîsporan ve hatiye nivîsin.

#### Tiştê ez niha dînîvîsim:

Ez zêdetir di vê demê de meqaleyên rojnamegerî dînîvîsim, lê karê min li ser pirtûkek min a helbestan bi zimanê Bulgarî ye, ku niha daxwaz ji çapxaneyekê bi Bulgarîstanê heye ku çap bikin.

### Hesenê Metê

#### Tu bêtir çi dixwînî?

Çi tiştên xwes ku bi dest min dikeve ez dixwînim. Wek roman, çîrok, lêkolîn, şîr û hwd.

#### Çi dînîvîsî?

Ez bi xwe novelan dînîvîsim. Carna kurt carna ji dirêj dibe, lê ez bi xwe novelan dînîvîsim.

### B. Welatevîn

#### Çi dîxwînim:

Ez hem bi Kurdî, hem bi Tirkî û hem ji bi Swêdî pirtûkan dixwînim.

Pirtûkên ku bi Kurdî dixwînim; 1 - Epîlok - Hesenê Metê, 2 - Destpêka edebiyata Kurdî - Mehmed Uzun.

Ya bi Swêdî; - Jiyana Min - Nelson Mandela, Yen bi Tirkî; 1 - Felsefe Tarîhî - Gokberg, 2 - Islam ve Kadin.

Ez van herçar kovarên Kurdî ji dixwînim; navê kovaran ev in: Nûdem, Helwest, Berbang û Çira.

#### Çi dînîvîsim:

— Ji bo şagirtên dibistanê tekst û material.

— Serpêhatî

— Hîkaye

— Çîrok û kurteçîrokên demên din werdigerînim Kurdî

— Carna ji nivîsên siyasî, wextê pêwîstî dibînim.

## Zeynelabîdîn Zinar

### **Çi dinivîsim:**

Niha ez ferhengeke amade dikim, dinivîsim. Ez xebateke pir texlît dikim; tîpguhezrina klasîkên Kurdî, nivîsandina tiştê folklorîk ji şerîtan û amadekirina ferhengeka Kurdî bi Kurdî û amadekirina tesfîreke quranê. Ez destana Hemdîn û Şemdîn ji dinivîsim.

### **Çi dixwînim:**

Pirtûkeke hefteya çûyî kete destê min, navê wê "Umut Kent : Batman - Bajarê Umîdê : Batman" e, ez wê dixwînim. Ev pirtûk bi tirkî ye. Îcar ku yek bibêje te çima navê yeka bi Kurdî negot, ev pirtûk ji bo min girîng e. Ez ji Batmanê me. Ji bo ku ez ji Batmanê me, ez dixwazim vê Batmana nû nasbikim.

## Maruf Yilmaz

Ez niha bi Swêdî pirtûkeke dixwînim. Navê wê "Frân Platon Till Gorbatjov" e. Nivîskarê pirtûkê Sven - Eric Liedman e. Swêdî ye, redaktorê rojnamaşa "Aftonbladet" ye. Naveroka wê li ser politîka çiye û demokrasiya antîk çawan bû, pêwendî û wateya wê li gor wê demê û li gor dema niha ye.

Pirtûka Kurdî ku min herî dawî xwend e, romana Mehmed Uzun, "Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê" ye. Ev roman bi tevahî li ser şerê qirêj e. Romanek modern e. Ev roman di warê teknîk, naverok, tema û hevsaziyê de romanek nû ye.

Ez niha hem çîrokan dinivîsim û hem ji romanek dinivîsim. Navê romanê "Key Xesro" ye. Ev roman bi tevahî li ser mítolojiya dema Medan e. Her çiqas li ser mítolojiye ye ji, di tê de ude-qeder- naverok û teknîk heye. Lehengên sereke di romanê de hetanî dawiyê di berxwede dide. Bi tevayî di şexsiyeta Asurbanîpal (Dehak) de, xirabî, pîsîtî, mîrkûjî, hilebazî û xwînrijî heye. Û di şexsiyeta lehengê romanê Key Xesro de ji, mîrxasî, civatbezî, başî, azadî û wekhevî heye. Loma ji roman e.

## Mihemed Dehsuwar

Ez timî du pirtûk dixwînim. Ez pirtûkeke bi Îngilîzî dixwînim û yekê ji bi Kurdî dixwînim. A Kurdî ku dixwînim, pirtûka Yaşar Kemale ku;

Mistefa Aydogan wergerandiye "Sultanê Filan" e. A Îngilîzî roman e. Roman li ser rewşa Irlandayê û IRA'yê ye.

Ez bi Kurdî romanek dinivîsim. Lê nivîsîna romanê hèj neqediye. Naveroka wê ji bila niha bimîne.

## Lokman Polat

Min romanek nivîsand û qedand. Roman 270 rûpel e û navê wê "Kewa Mari" ye. Di nêzde ez dê vê romanê biweşînim. Niha ji min dest bi romanek din kiriye. Navê vê romana nûh ji "Filozof" e. Ev roman dê romanek gelek balkêş be. Min romana xwe ya yekemîn bi Kurdî nivîsî, ez vê romanê ji bi Kurdî dinivîsim. Di gel roman-nivîsê gelek nivîsên din-meqale, nirxandin û analîzîn berhemên edebî- amade dikim û di kovarêna cuda de diweşînim. Ji sê mehan carê ji hejmara nû ya kovara Helwestê amade dikim.

Ez li gel nivîsînê gelek ji dixwînim. Wexta min piranî bi xwendinê derbas dibe. Ez gelek kovar û pirtûkên romanen dixwînim. Heftê du roj ji diçim bîbliotekê û li wir rojnameyên rojane yên bi Tirkî û kovarêna hefteyî dixwînim. Ez aboneyê gelek kovarêna edebî me ku bi Tirkî li Tirkîye derdi Kevin. Kovarêni siyâsî yên bi Tirkî ji dixwînim, lê bi giranî kovarêna edebî dixwînim. Kovarêni ku ji alî Kurdan ve derdi Kevin ci kovarêna edebî û ci yên siyâsî, hemûyan ji dikirim û dixwînim.

Ez ji du, sê mehan careke lîsteyeke pirtûkan amade dikim û dişeynim ji Stenbolê wan pirtûkan dikirim, tînim. Pirtûkên ku ez dikirim pirtûkên li ser Kurdan in û yên din ji pirtûkên edebî ne. Piraniya wan ji roman in.

Niha romana ku di destê min de ye û ez dixwînim navê wê "Bexçeyê Ronahîyê" ye. Nivîskarê romanê Amîr Maalouf e. Nivîskar bi eslê xwe ji Lubnanê ye, lê ew Ereb nîn e. Ew xwe wek Kurdekkî, wek Tirkekkî û wek Ermenîyekî di-hesibîne. Roman, romanek felsefi ye.

**HÛR BINÊRE, KÛR BINÊRE,  
DÛR BINÊRE!  
BIXWÎNE!  
XWENDIN ZANÎN E!**

# SEDSLALIYA ROJNAMEGIRIYA KURDÎ LI ME PÎROZ BE

## Şahînê Bekirê Soreklî

MIQDAD MIDHET BEDIRXAN di sala 1898an de li Qahîreyê yekem rojnameya kurdî di bin navê KURDISTAN de bi tîpên erebî weşand. Li gor agahiyê di dest de (El Demokratî: 3/98), jiyana rojnameyê çar salan domand, bi weşandina 31 hejmaran: 1-5 li Qahîreyê, 6-19 li Cinêvrê, 20-23 dîsan li Qahîreyê, 24 li London, 25-29 li Folkston, başûrê Îngiltanê û 30-31 dîsan li Cinêvrê. Ev jî dijwartiya rewşa Bedirxaniyan û astengên ku Dewleta Osmanî didan pêş wan diyar dike.

Di vê gotarê de min dil niye di derbarê pirsa rojnamegiriye û rojnamevaniyê de pesin û senaya Kurdan bidim. Ez ê bi çavekî rexnegir li rewşa rojnamegiriya kurdî seyr bikim bi amanca diyarkirina çend egerên berbendkirina pêşveçûna rojnamegiriya kurdî. Bêyî guman e ku bindestbûna gelê Kurd roleke grîng di rewşa îroyîn ya rojnamegiriya kurdî de heye lê ez wisa bawer im ku pirraniya Kurdan di derheqê vê yekê de kêm-zêde haydar in. Ji lewre gotar ê xwe bêtir bi rola Kurdan ve mijûl bike.

Di warê rojnamevaniya serbest, objektîv (bi mewzûyet) û hemdemî de gelê Kurd bi dehsalan li dû cîhana pêşkeftî maye. Min hay ji rojnameyekê nîne ku rojane ye, serbest e, serbixwe ye, rojnameyeke ku ji aliyê hejmareke layiq ji Kurdên hemî besên Kurdistanê de tête xwendin. Li milê din, dema mirov rojnameyeke kurdî dide hember rojnameyên wek TRIBUNE, DIE ZEITUNG, LE MONDE, yan SYDNEY MORNING HERALD, mirov pê dihese çiqa rojnamegiriya kurdî li paş maye.

Em hemî kêmasiyêne xwe bi rewşa Kurdan ve peywendîgir dîkin dixin stuyê dewletên serdest û stemkar. Bêyî guman, bindestbûna neteweya kurd roleke mezin dileyize, lê li milê din, dema em bi şêweyeke felsefî li rewşê seyr bikin, em ê tê bigihêne ku şevreşî dikare tenê li wan cîhan bidomîne ku ji ronahîye bêpar in. Bi gotineke din, rast e dewletên serdar nehîştine ku ronahî xwe bigihîne Kurdistanê, lê di nav Kurdan bi xwe de jî çaviyeke zanyariyê ci caran negîhîştîye wê radeyê ku bikaribe wek agirê ji devê volkanekî şevreşiyê biçirriñe. Heke çaviyeke wisa di dem û dewranenê cuda de hatibe holê jî neteweya Kurd nikaribûye lê xwedî derkeve. Gelê Kurd di gellek şoreşen çekdar de besdar bûye, lê min hay ji şoreşike zanyarı nîne ku di nav gelê Kurd de cîh girtibe.

Sedsala 21emîn li pêş dêrî ye, lê mixabin hîn rojnameyeke rojane yan heftaneye rêk û pêk li tevâhiya Kurdistanê, yan di nav Kurdên li derive de nîne. Gelo çîma?

Yekem astengên li pêş rojnamegiriya kurdî xwe bi ziman û xwendinê ve peywendîgir dîkin. Hejmareke gellekî bilind ji Kurdan nedizanin bi kurdî bixwênin. Helbete sedemên vê yekê diyar in û hewce nake li vir behsa wan bête kirin. Li milê din, hebûna zarav û du alfebeyên cuda jî astengên bêhûde li pêş rojnamegiriya kurdî diafirînin. Ci dewletên kurdî nebûne ku bikaribin bernameyeke yekgirtina zimanê kurdî bi rêxin, bi amanca pêşvexistina kurdiyeke bilind, wek EL EREBIYYE EL FUSHA, HOCH DEUTSCH, yan STAN-

DARD ENGLISH. Heke dewleteke kurdije jêhaflî hebûya dê herweha bikaribûya pirsgilêka alfabebla kurdî çareser bike. Cîhê dax û mixabê ye ku partiyêne Kurdistan çi rolên grîng û mezin di derbarê pirsên zimanê kurdî de neleyitzine. Bi encama van astengan rojname û kovarêne hene jî tenê ji aliye hejmareke biçük ji Kurdistan de têyêne xwendin. Ji aliyeke din ve, Kurdêne xwendinzan jî zor kêm dixwênen. Ew jî wek pirraniya endamên gelên Rojhelata Navîn bi giştî ne kesen xwendinhej in. Wek nimûne, hejmareke mezin ji xelkê Ewropaya Rojava û Bakur di rê de, di dema tatîlan de û li mal ne tenê rojname û kovaran dixwênen lê herweha romanen û pirtûkên din jî dixwênen. Ev adet di nav gelên Rojhelata Navîn de, û bi taybetî di nav Kurdistan de, ji ber sedemnêne cur be cur nîne. Lewma nezanî û nîvzanîn didomîne, çimkî zanyarî û Pêşkeftina ramyarî ji xwendinê tê. Mebest bi xwendinê ne çûna dibistanê ye, heta ne ew e ku yek bibête piyîşk yan mamosta, lê ew e ku mirov roj bi roj di derheqê herêma xwe û bûyer û pêşveçûna cîhana xwe de bixwêne, herweha xwe di derbarê dîrok û rewşa îroyîn ya ramyariyê û zanîtiyê de agahdar bike.

Celadet Bedirxan ber 65 salan di hejmar 17 ya kovara Hawar de van rêzan nivîsandine (Mihemed Bekir, Berhevkirina hejmar 1-9 yêne kovara HAWARê, rûpel IX):

"Xorto! Armanca te rizgarî ye. Rizgariya welat û milletekî ye. Navê armanca te Kurd e, kurdanî ye, Kurdistan e [...] Armanca te di şiklê mirovekî de ye [...] Lingê wî yê rastê bere pêş, yê çepê berepaş dicit. Laş di cîhê xwe de ye. Xwe ne dide pêş, ne jî paş, ji ber ku ji aliyeke ve pêş ve, ji aliyeke ve paş ve tête kişandin. Tu zanî ci ra, xorto? Lewma ko her du ling ne yek in. Navebra wan de yekînî nîne. Divêt, tu bixebeitî van her du lingan bi alîkî ve bilivînî."

Belê, Celadet bang li xortêne kurd yêne ber 65 salan dike, lê gelo ji 100 000 Kurdêne wê demê yekî va gotina Celadet Bedirxan xwendibe? Heke ber 65 salan ji 100 000 Kurdistan yekî gotineke wisa xwendibûya heye ku rewşa gelê Kurd îroy cawaz bûya.

Astengeke din nebûna erf û toreyêne demokratî ye di nav Kurdish de. Li gel ku partiyêne Kurdistan ji bo demokrasiyê têdikoşin jî, di nav wan bi xwe de demokrasî gellekî bi sînor e û yan jî rewşa li Kurdisanê wan neçar dike ku dest bi tevahî ji demokrasiyê berdin. Li milê din, li nik nivîskarêne Kurd bi xwe jî ew zanisî û îmkana nivîsandina objektîf/mewzûî nebûye û hîn îroy jî bi sînor e. Dema mirov bala xwe dide rojname û kovarêne kurdî, mirov dibîne ku nivîskarêne Kurd xwe bi pirranî bi pirsên siyaseta kurdî ve, rasterast, yan nerasterast, eleqedar dikan, her kes li gor zanîna xwe. Di nav wan de zor kêm kes hene ku xwendina rojnamevaniyê di zanîngehan de kuta kiribin.

Pêkaniya wan ya li dervayê vî qalibî gellekî bi sînor e. Ev nayê wê xwebêjê ku di nav Kurdish de rojnamevanen têgîhîst nînin. Hene, lê bi pirranî, yan bêkar in, yan jî neçar bûne ji dezgehêne nekurđî re bixebeitin ji ber sedemnêne aborî, siyasî û yên din. Hindekên din nedizanin bi kurdî baş binivîsînin. Li milê din, çığa rojnamevan û nivîskarêne Kurd ji dewletên serdar bitirisin jî, tırsa wan ji partîyan û mirûden partîyan zêdetir e. Tenê di nav çend salên borîn de piçek pêşveçûn hatiye holê û hindek nivîskarêne li derive û çendekên li hundir dest pê kirine bêtir bi azadî binivîsînin, lê hîn jî nedikarin, yan newêrin tevahiya rastiyê binivîsînin. Bi gotineke din, tevahiya rastiyâ di derbarê rewşa siyaseta kurdî de hîn nehatiye nivîsandin! Gellek tiştên bi siyasetê û bi rewşa civakî ya Kurdish ve peywendîgir ta roja îroy wek tabû dimînin, yanê di bin palasê de veşarfî ne, û axiftina li ser wan tenê bi kustepist û bi dizî dibe. Rojname û kovarêne partriyan, li milê din, propagandîst û yekalî ne. Amanca wan bi pirranî zêdetir berjewendiya teng ya partiyê, tûjkirina hestêne mirûdan û belavkirina demagociya rêexistinê ye. Hejmareke ji rojnameyêne ku xwe wek serbixwe didin nasîn herweha kêm-zêde bi eynî metodêne ajîtasyonê bi rê ve diçin û bi pirranî ji nivîskarêne objektîf û berfireh bêpar dimînin. Rojname û kovarêne kurdî bi pirranî, wek tête gotin, "di nav dohnê xwe de diqewirin" û ji bûyer û pirsên cîhanî yêne siyasî û zanyarî dûr dimînin. Bi gotineke din, çapemeniya kurdî hema-hema xwe ji tevahiya cîhanê bi dûr xistiye û "di nav dohnê xwe de

diqewire." Bi encama vê şêweya rojnamegiriyê, kesên dikarin bixwênin jî bi pirranî têyên mêtîşustîn, dîbin mîrûdêñ partîyan, dîbin neynikêñ eyñî raman û metodan, yan jî dest ji xwendina rojname û kovarêñ kurdî berdidin.

Rojnameya ARMANC ku di sal 1979 de li Swêd dest bi jiyanê kir wê demê bi xwe rojnameyeke demagociyê û propagandaya siyasî ya rêxistinî bû. Lê ARMANC bi derbasbûna salan re ber bi pêş cû, bû rojnameyeke tevahî bi kurdî û kêm-zêde serbixwe. Li dû 18 salan û 178 hejmarañ ARMANC Ca di sal 1979 de li Swêd dest bi weşanê kiribû rawestiya. Çima? Ji ber ku rojname bi aîkariya aborî ya dewleta swêdî, wek pirraniya weşanêñ kurdî li wir, derdiket û dema aîkariya aborî kêm bû, ARMANC jî rawestiya. Sedemeke din, wek Mûrad Ciwan, endamê redaksiyonâ ARMANC di hejmara dawîn de/hejmar 178: 6-7/97) dînivîsîne ev bû:

"Rojnamêñ ku di nava Kurdan de têñ derxistin, yan li bal hêzêñ siyasî yêñ illêgal, yan jî li bal komelêñ li derveyî welêt têñ derxistin. Ev komele jî hemî di bin tesîra hêzêñ siyasî de ne, siyaset destê xwe dirêjî nava her karê wan dike. Adeta rojnamexwendin di nava vî milletî de gellekî kêm e. Rojnamêñ ku têñ belavkirin, yan bi say, şerm, an tîrsa siyasiyan e, yan jî ji bo nîşandana terefdarîyeke siyasî ye. Tu caran tu rojname bi saya kîrîn û aîkariya xwendevanêñ xwe ne jiyanê."

Hindek ji me babetê rojnamevaniya kurdî ya li holê wek li berjewendiya gelê kurd dizanîn. Lê tecrûbeyêñ li welatêñ din baş diyar dikin ku ev metodeke şas e û ji bo amancêñ dûr ne li berjewendiya ci gelan e. Dema mirov tecrûbeyêñ li welatêñ Yeketiya Sovyêtî ya berê, Yûgoslavaya berê, Albanya, Spanya, Çîlê û heta Çîna îroj dide ber çav, mirov digihê wê encamê ku mêtîşustîna xelkê, afirandina mîrûdan û rîbirrîna li tradisyonêñ demokratî, toleransê, hevpejirandinê û rojnamevaniya bi mewzûiyet dikarin ji bo amancêñ dûr tenê ziyanê bigîhînin rewşa geleki. Xwebêja vê yekê ne ew e ku ramanê niştimanperweriyê û daxwaza azadiyê bêyêñ berbendkirin, lê ew e ku baştîrîn rê ji bo perwerdekirin û têgîhandina endamêñ nete-

weyekê bikarhanîna tradisyonêñ demokratî û rîdana ji bo bîr û baweriyêñ pirralî û cudaşêweye ye.

Gelşen li jor hatînî diyarkirin hindek ji wan egeran in ku dîbin sedemêñ afirandina astengêñ mezîn li pêş rojname û kovarêñ kurdî, wek nizimtiya kalîteyê û dijwarbûna frotina wan. Wekî Murad Ciwan jî li jor diyar kir, li Kurdistanê bi xwe bi pirranî tenê ew rojnameyan dikarin jiyanâ xwe bidomînin heke rêxistineke siyasî, yan dewletek, li paş wan be. Li dervayê Kurdistanê dîsa tenê ew weşananan didomînin ku rêxistinê siyasî li paş wan in, yan jî dewleteke biyanî aîkariya aborî dide. Li welatekî wek Swêdê gellek rojname û kovaran dest bi weşanê kirin, wek Rizgariya Kurdistan, Kurdistan Press, Armanç, Berbang, Mamostay Kurd, Roja Nû, Gizing, Kulîlk, Îsot, Roj Baş, Nûdem, Çira, Helwest, Vate, Dugir, Zend, Dîdar û yêñ din. Di nav van rojname û kovaran de yek jî nîne ku bi encama frotinê xwe idare kiriye û domandiye. Gellekan ji wan tenê salê 3-4 hejmar weşandine û hindek ji wan, wek Kurdistan Press, Armanç, Mamostay Kurd, Îsot, Roj Baş û Dîdar neçar mane ji ber sedemêñ aborî rawestin. Heta li Stenbolê be ku tê gotin bi milyonarı Kurd lê dimînin rojnameyêñ kurdî di warê xwe-idarekirina aborî de tûşî gellek dijwariyan têyên. Heke nîşekî ku ji xwendinê hej dike, nîşekî ku rojnamevaniya bi kalîte û mewzûiyet teqdîr dike neyêt holê ev dijwariya li pêş rojname û kovarêñ kurdî dê her bidomîne, wekî ku ev bûn dora 70 salan didomîne. Bi encama vê rastiya li holê, gotina ku dewletêñ serdar xwendina kurdî qedexe dikin û ji lewre Kurd ji xwendinê bêpar in nedikare wek gotineke sed ji sedî rast bête pejirandin. Heke li tevâhiya Ewropa rojnameyeke rojane, tew hema heftane, bi zimanê kurdî nebe ku xwe bi saya frotinê idare dike, wê demê yan gotina ku li Ewropa dora milyonek Kurd hene ne rast e, yan Kurd nikarin rojnameyeke layiqe frotinê derînin, û yan jî gotina ku dijmin nahêle Kurd bixwênin ne yeke bi tevahî rast e. Camêrên wek Celadet Bedirxan û Dr. Kamêrân Bedirxan hîn di salêñ 30an û 40an de bizav kirine ku ji bo Kurdan rojname û kovarêñ bi kalîte biweşînin. Li gel fidakariya wan ya bêhempa û li gel ku wan weqa hewl dane aîkariyê ji hukmata frensî û yêñ din bigirin jî di dawiyê de ew neçar

mane hemî kovarên xwe rawestînin ji ber ku piştgiriyeke aborî di nav Kurdan bi xwe de nebûye û berhemên wan tenê ji aliyê çend kesan de dihatine xwendin.

Celadet û Kamêran Bedirxan di derbarê vê pirsê de peywendî li gel Kurdên hemî besên Kurdistanê danibûn û kovara HAWAR bi alfebeya erebî dest pê kiribû, lê çi alîkariyeke rêk û pêk ku berdewamkirina wan berheman misoger bike negirtibûn. Kovara HAWAR di sal 1932 de dest pê kiribû û di 1943an de rawestiya bû. Kovara RONAHÎ di sal 1942 de li Şamê dest pê kiribû û li dû weşandina 28 hejmaran di 1945an de rawestiyanabû û kovara ROJA NÛ ji aliyê Kamêran Bedirxan de sala 1943an li Bêrûtê hatibû weşandin û li dû weşandina 73 jîmaran di sal 1946 de dawî dabû weşana xwe. Celadet û Kamêran Bedirxan hebûn û jiyanâ xwe pêşkêse gelê xwe kirin, lê mixabin ew dilşikesfî û perîşan man û gelê Kurd yê nexwende nikaribû di wê demê de ji leheya zanyariya wan sûdê bigire. Kamêran neçar ma ji bo jiyanê biçe Parîsê û Celadet li dawiyê neçar ma biçe li ser zeviyê xelkê, ji welatê xwe dûr, çandiniya pembû bike. Li nêzîkî Şamê ew bi encama qezayake motorâ ava bîra xwe dimire. Celadet di 22ê nîsana 1951ê de ji kebaniya xwe Rewşen re vê nameyê dinivîsîne (Hemreş Reşo, di pêşgotina berhevkirina hejmar 24-57 yên HAWARê de):

"Ez dixwazim berî mirina xwe, ku ne dûr e, tiştekî biçük ji we re bihêlim. Ma ev ne hewce ye? Tiştekî ku ez dixwazim, xwedê bi destê min bigire. Bawer dikim ku ez bi pêwîstiyê xwe, ji bo gel û welatê xwe bi awakî çak û bêtir ji rabûm, û nuha divê ji bo mala xwe ji tiştekî bikim."

Mirovekî jîr û zanyar ew qas fidakarî ji bo gelê xwe kiriye lê wî gelî nedikaribûye wî û sê-çar endamên malbata wî xwedî bikin. Dema di nav neteweyekê de mezinmirovekî wek Celadet Alî Bedirxan, li dû ew qas ked û xebata neteweyî û çandî, biçe ji xelkê re çandiniyê bike, dilsar û perîşan bimire, wê demê ew netewe ne layiqe vêketina çirayê ronahiyê ye û dê hêñ bi salan di şevreşîya nezantiyê de vegevize. Rewşa vî gelî di warê xwendin û zanyariyê de do wa bû û îroj ji ta

radeyekê wisa ye. Nivîskarên Kurd, rojnamevanên Kurd, hunermend û zanyarên Kurd hîn ji bi pirranî perîşan û dilşikestî dimînin. Ew bi pirranî yan ji aliyê dewletê serdest de têyên girtin û kujitin, yan ji dibin nêşanên kevir û şijikêñ ïhaneta partîyan, rêxistinêñ kevnisperest, mirûdan û nezanan; yan seri datînin û xwe dixin nav penabertiyekê hundirîn, û yan ji welêt li cih dihêlin û direvin derve. Wisa ji ew mêjiyê zanyar yê li Kurdsitanê heye ji beşekî mezin ji xwe wenda dike. Girtina qedir û nerxê xizneyên zanyariyê yên neteweyî di nav Kurdan de yan nîne, yan tenê bi dev e, ew ji bi pirranî li dû mirina mirovekî nerxbilind. Bi dehan şarezayêñ kurd diçin li welatêñ biyanî dibin penaber ji bo xatirê pariye nan, hunermendêñ neteweyekê ku tête gotin hejmara endamên wê ji sih milyonan bêtir e nikarin hezar kasêtêñ xwe bifroşin, rojname û kovarêñ hêja radiwestin çimkî pênc sed xwendevanêñ wan nînin, ... Zarav û alfebeyêñ cawaz li pêş yekgirtina zimanekî wek asteng dimînin, di demekê de ku dahola propaganda û pêkhanîna mirûdan didomîne, kesen bi gotinê comerd û bi kirinê miqrîs bêhejmar dimînin, feylesofêñ nexwende û nîvzan bêtir dibin, derewîn û mizawir û bazirganêñ bi kurdayetiyyê pirr dibin, û helbete rojnamegiriya kurdî di rewşike wisa de bi gavêñ gellekî hêdi ber bi pêş diçê.

Bêyî guman gellek asteng û dijwariyêñ din ji hene li pêş rojnamegiriya kurdî, wek stemkariya dewletêñ ji şaristaniya pêşkeftî dûr (wekî li jor hat gotin, min nexwazî di vê gotarê de behsa dewletêñ serdest bikim, çimkî kurdekî ku hay ji stemkariya wan nebe nîne), nebûna hejmarêñ bilind ji kadirêñ jêhatî û pêkan, bêparmâyîna ji teknika nûjen, pirsgirêkên civakî û gellekên din.

Min hêvî ji Kurdên li derve heye ku rojname û kovarêñ baş yên welatêñ ew lê dimînin bixwênin û fêr mewzûiyetê, toleransê û demokrasiyê bibin; ne ku li dû mayîna 20 salan li derve ji gundiyyê xwe bêtir li paş bimînin û ji şaristaniya hemdemî tenê qaqlan bi dest xin. Çawa be, li welêt gundiyyê wan bi derbasbûna salan re li gor imkanêñ xwe berepêş diçin. Zihniyeta hindek kesen li derve, li milê din, her wek xwe dimîne, yan wek zihniyeta hejmareke ji muhacir û penaberêñ "cîhana sêyem

û çarem" heku diçe berepaş diçe (nimûneyek: piştgirên muslimanê tundrê yên Cezayir). Min hêvî heye ku Kurdên li derve tiştekî erênî bidin welatê bapîr û dapîran. Min hêvî heye ku ew partiyêñ Kurdistanê fêr toleransê û hevpejîrandinê bikin, ne ku bibin mirûd û li ber agirê belavokan rabin dîlanêñ nefret û aqîtasyon û serîşkiyê. Min hêvî heye ku ew xwe fêr xwendina kurdî bikin, piştgiriya rojname, kovar, nivîskar û hunermendêñ Kurd bikin.

Pêwîst e bête gotin ku di nav çend salêñ borîn de hejmareke ji nivîskar û rojnamevanêñ jêhafî hatin holê. Hêvîdar im bikaribin bêtir sôd bigîhînin gelê Kurd. Îroj li derve û hundir, li gel hemî asteng û dijwariyan jî, rojname, kovar û bernameyên radyo û televizyonê bi kurdî hene û bivêt nevêt ew ê rojnamegiriya kurdî berepêş bibin. Li milê din, kesêñ bi îradeyêñ polaşî, çığa hindik bin jî, di nav nivîskar û rojnamevanêñ kurd de hene ku her bizavê dîkin ziman û edebiyat û rojnamegiriya kurdî qencitîr û çaktır bikin. Pêwîst e ew bi dil û can bêyên pîrozkirin.

Ez ê bi van rêzan gotara xwe bi dawî wînim: Heke gelê kurd bixwazibe wek beşekî ji cîhana pêşkeftî di sedsala 21emîn de cîhê xwe bigire, pêwîst e bi gavêñ gellekî bezatir ber bi pêş biçe û xwe ji sinciyêñ şerûde yên paşvemayînê, herweha ji metodêñ retorîk yên siyaseta welatêñ Rojhelata Navîn û hawayêñ propagandîst yên stalînîst û behsîst azad bike. Yan na, ew ê cîhê xwe di nav neteweyêñ cîhana 4emîn de misoger bike. Ji ber ku va gela ne xwedan dewlet e pêwistya herî grîng li ser milêñ partiyêñ siyasî yên vî gelî ye. Gelê kurd hewcedarî bi rojname û kovarêñ çak heye ku bikaribin tiştekî nû û bi kelk bidin wî, herweha bi dezgehêñ radyo û televizyonêñ serbixwe (ma ew ê ne baş be, wek nimûne, heke partiyêñ wek Yekîtiya Niştimanî Kurdistan, Partiya Demokrat ya Kurdistan û Partiya Karkerêñ Kurdistan di nav hev de salê milyonek dolar bidin komîtiyeke serbixwe ji bo damezirandin û birêvebirina dezgeheke radyoye serbixwe. Bila navê wê Radyoya Zimanê Kurdî be û bila rojê du-sê saetan bernameyan pêşkêş bike, bernameyên ji siyaseta parriyan û aqîtasyonê û hêvotinê dûr, bernameyên ku bikaribin zimanê kurdî ber bi yekgirtinê bibin, çanda kurdî zindî bihêlin û Kurdan di warê zanistîyê û

şaristaniyê de perwerde bikin. Ma amanca her sê partiyan ne ev e?!!!). Gelê Kurd hewcedarî bi xwendinê, zanistîyê û pêşveçûna ramyarî heye, hewcedarî bi zimanekî standard, bi alfebeyeke yekgirtî heye ku bikaribin hestêñ neteweyî hêvan bikin û Kurdan ji ev cudabûn û jihevbelavbûna malwêran azad bikin. Partiyêñ siyasî divêt têbikoşin ku li gor mercêñ nûdemî gavêñ xwe bi hev re ranin, yan na, laşê neteweya kurd, wekî ku Celadet Bedirxan pêş 65 salan gotibû, dê her di cîh de bimîne, gavekê bere pêş û yekê berepaş biçe. Bila em hêvî bikin ku di nav 10 salêñ dahatû de çirûskêñ ronahiyê bibin tîrêj û rê li pêş gelê Kurd rohnî bikin da ku bikaribe bi serbilindî serê xwe di nav gelan de rabike û jiyanekî ji ya me hêasantir û bi rûmetir ji bo nifşen pêşerojê misoger bike.

Bila sedsaliya rojnamegiriya kurdî li me hemiyan pîroz bel

***Paşgotin:*** Heye ku nivîsandina gotareke wisa li keyfa gellekan ji me neyêt û heye ku kovarine kurdî rê nedîn weşandina wê jî. Wekî kurdekî ku ev bûn sîh û sê sal li dervayê Kurdistanê, lê di eyî demê de di nav pirsa kurdî de, dimîne, min nivîsanidina wê pêwîst dît. Hejmareke ne biçûk ji nivîskar û rojname û kovarêñ me, herweha bernamayêñ radyo û Televizyona MED bi şêweyeke erênî behsa sedsaliya rojnamevaniya kurdî kirin; nivîskarine behsa hindek aliyên kêm yên rewşa rojnamegiriya kurdî jî kirin. Hêvîdar im cîhê gotareke bi vê nolê jî di bîranîna sedsaliya rojnamevaniya kurdî de hebe, çığa ramanêñ tê de ne bi dilêñ hindekan ji me bin jî. Bi dîtina min, dem hatiye ku Kurd bi şêweyeke bêtir rexnegir û objektîv li xwe û rewşa xwe seyr bikin, bi amanca afirandina şert û mercêñ çaktır ji bo pêşeroja neteweya kurd).

***Têbinîya Helwestê :*** Em di gelek waran de bi dîtinêñ nivîskar Ş. B. Soreklî re nîn in, em wek wî nafikirin, lê ji ber ku em demokrasîyê, azadiya fikrî, ramanî diparêzin loma me vê nivîsê weşand. Heger rexneyêñ li ser vê nivîsê hebin, em dê wan jî biweşînin. Em dixwazin li ser vê mijarê munaqeşe çêbibe. Bila nivîskar û xwendevan dîtinêñ xwe diyar bikin. Bê munaqeşe û rexne pêşveçûn çenabe.

Zanîna Zimên  
 SIRÊ MORFOLOJÎ

2

Pervîn Şerefnaz

D) DUCARKIRINA NAVÊN HEJMARAN:

yeka-yek	dudu-dudu
sisê-sisê	çar-çar
pênc-pênc	

DUCARKIRINA BÊJEYAN  
 BI PAŞKOKÊN (I, K, OK) VE:

a) paşkoka "î":

gulgulî	gitolgitolî
zaxzaxî	sorsorî
şaxşaxî	taltalî

b) paşkoka "ik":

gulgulik	mijmijik
girgirik	xaşxaşik
reşreşik	gezgezik
zerzerik	mezmezik
tirtirik	çırçırık

c) paşkoka "ok":

mijmijok	gezgezok
girgirok	vizvizok
vinvinok	ginginok
pirpirok	

BÊJEYÊN HEVBEND ÊN KU NÎRANAN ÇÊDIBIN:

Bêjeyên ku bi vî awayî çêdibin yan du navdêr bi alîkarîya pêrbestan digiyên hev, yan jî du rengdêr bi alîkarîya pêrbestan digiyên hev û pek têr, wek:

roj bi roj	der bi der
rû bi rû	kurt e kurt

BÊJEYÊN HEVBEND ÊN KU BI PÊRBESTAN ÇÊDIBIN:

Bêbejêr ku bi vî awayî çêdibin yan jî du pêrbestan yan jî ji bêjek û pêrbestekê pêk têr, wek:

jê re	lew ra
şûn de	pê-re
tê de	

HÊJEYÊN HEVUDUDANÎ ÊN KU JÊ PÊWENDAN ÇÊDIBIN:

Bêjeyên bi vî awayî ji çend pêwendan çêdibin, wek:

da-ku	ji bo ku	ji ber ku
-------	----------	-----------

**BÊJEYÊN KU BI PAŞKOK Û PÊŞKOKAN  
ÇÊDIBIN:**

Em ê bêjeyên ku bi vî awayî çêdibin jî dibin sê rêzan de bivînin, ew jî:

- 1- Navdêrên bi paşkok û pêşkokî
- 2- Rengderêr bi paşkok û pêşkokî
- 3- Lêkerêr bi paşkok û pêşkokî

**I- NAVDÊRÊN KU JI PÊŞKOKAN  
ÇÊDIBIN:**

Bi paşkoka "ber":

ber+stu	ber+nav
ber+roj	ber+bang
ber+koz	

Bi pêşkoka "ser":

ser+wext	ser+sal
ser+kanî	

Bi pêşkoka "bin":

bin+pê	bin+çene
bin+erd	bin+dest
bin+ar =şax	

Bi pêşkoka "nav":

nav+mal	anv+çav
nav+ser	nav+bir
nav+ber	

**NAVDÊRÊN KU BI ALÎKARÎYA  
PAŞKOKAN ÇÊDIBIN:  
BI ALÎKARÎ "ik"**

Ev paşkok piştî bêjeyan têt nivisandin, lê dîtina wê bêjeyê naguherîne, ji bo biçükkirin û xweşikkirina tiştên bê can û bi can têt bikaranîn.

berx	berx+ik	kar	kar+ik
mal	mal+ik		
kur+ik		kur	

keç	keç+ik	jin	jin+ik
bav	bav+ik	dar	dar+ik
sel	sel+ik	dil	dil+ik

"ek"

Ev pêşkok têt dawîya bêjeyan û bêjeyên nuh çedîkin, wek; (ev tişt ji bo nebinavkirina navdêran û ji bo yekejimarî têt bikaranîn)

pişt+ek	dest+ek
nîv+ek	mad+ek

Bi paşkoka (stan): Ev paşkok cihê waran û cihê karan diyar dike.

Kurdi+stan	Erebî+stan
daristan	gulîstan
Rûsi+stan ??	garistan

Bi paşkokên "den-dan-dîn"

ka+dan	ka+dîn
kevçî+dan	hubur+dan

Bi paşkoka "geh": Ev paşkok jî ji bo cihê waran têt bikaranîn, wek;

pê+geh	ban+geh
wer+geh	şer+geh
dol+geh	ber+geh
der+geh	derman+geh
havîn+geh	kar+geh

Bi paşkoka "xane": Ev jî ji bo navêñ war têçt bikaranîn, wek;

kitêb+xane	ders+xane
şerab+xane	bende+xane
kar+xane	nexweş+xane

Bi paşkoka "kî": Ev paşkok ji bo yekîtiya mîletan têt bukaranîn.

Ereb+kî                      Ermenî+kî  
 Kurmanc+kî                Ecem+kî  
 Bi paşkoka "ar":  
     nivisar          guhar

## 2. RENGDÊRÊN KU JI PÊŞKOKAN ÇÊBÛNE:

### Bi alîkarîya "bê"

bê+kar	bê+kes
bê+can	bê+nav
bê+mal	bê+serî

### Bi pêşkoka "ne"

ne+yar	ne+xwes
ne+merd	ne+zan
ne+çê	ne+merî

### Bi pêşkoka "ber"

ber+malî	ber+dest	ber+banek
----------	----------	-----------

## RENGDÊRÊN KU JI PAŞKOKAN ÇÊDIBIN:

"ek": dema ku ev paşkok hat dawîya bêjeyan, çawanîya mirovan yan jî tiştan dîyar dike, wek;

virr+ek	ser+ek
pars+ek	
xur+ek	bir+ek
gelişt+ek	rûnişt+ek
### bi kokên lêkeran çêbûne	

Bi alîkarîya "ok": Ev paşkok têt paşîya navderan, lêkeran û bêjeyen ducarkirî, wek

### a) bi navdêran re:

keçel+ok	şemam+ok
gul+ok	şîrîn+ok

### b) bi koka lêkeran ve:

rûnişt+ok	gelişt+ok
bez+ok	rev+ok

### c) Bi bêjeyen ducarkirî ve:

mijmij+ok	gezgez+ok
girgir+ok	xapxap+ok

### Bi paşkoka "ik":

Bipaşkoka "ik" ji bêjeyen ducarkirî ve dikare rengdêrên nuh çêke, wek;

gulgul+ik	sorsor+ik
çırçır+ik	reşreş+ik

Bi paşkokên "kar, dar, van, baz, saz, war (wer), mend)

Bi alîkarîyen van paşkakan rengdêrên nuh çedîbin, ev bêjeyen nuh ji karê mirovan dîyar dike.

### KAR:

xebat+katr	ser+kar
nivîs+kar	

### VAN:

berx+van	ga+van
derge+van	aş+van
bax+van	nêçîr+van
şer+van	pişte+van
xwende+van	bilûr+van
bêrî+van	pêşî+van

### DAR:

ser+dar	ders+dar
birîn+dar	deyn+dar
guh+dar	nobe+dar
mal+dar	remil+dar

### BAZ:

can+baz	fêl+baz
sér+baz	

### BEND:

sol+bend	mal+bend
saz+bend	heval+bend

### YAR:

hiş+yar	kirê+yar
bext+yar	pirsî+yar
rist+yar	

**Dumahîk heye**


# SERBILINDÎ Û SERKEFTINA ROMANA KURDÎ

Maruf Yılmaz

Mizgîn ji romanhezên Kurd re, ku Mehmed Uzun romana "Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê" nivisiye! Bêguman ev roman, romana baştırın a kurdî ye, ku min ta îro xwendiyê. Ev roman 350 rûpel e û ji aliyê Weşanên Avesta`yê ve li Stambûlê hatiye weşandin û ji 17 besan pêk dihê û her beşke wê, bi beşen din re girêdayî ye.

Îro hejmara romanên ku bi kurdî hatine nivîsin, ji hejmara tiliyên destekî ne bêhtir e. Herçendî çend roman hatibin nivîsandin jî, romana Kurdi ya nûjen tune bû. Lê di romana "Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê" de, tiştê ku bala mirovî dikişîne, warê herêkbûn, kûrbûn, psikolojiya hundirê mirovî û raxistina teknîka temaya romanê ye. Lewra, xala girîng e, ku romanê ji romanê nivîsi cihê dike; kûrahî, berfirehbûn, neynika hundirê mirovî û psikolojiya têkoşîna hundirê mirovî ye. Ev yek, vê romanê, ji romana klasîk cihê dike. Ev roman weke kok û gevûdê dara tiriyyê, ji şûneke dest pê dike, derdihê, şax dide û ji koka xwe hinekî dûr dikeve, dawiyê jî, li koka xwe vedigere... Ji serî ta dawiyê, "Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê" dijwar û dijberiya du hêzan li ber çavan radixe. Ji nav van dijwariyan, bala min bi tundî çû ser bûyera trajîk, li "Welatê Çiyan", ku ev bûyer di kesitiya Kevok û Bazî de diteqe. Ez bawer im ku, xwendevan dê bala xwe bidin vê derê. Li vî Welatî, malbat bela-wela ne û heta ku yar ji yarê dûr dikeve; dê û bav ji keç û kurên dûr dikevin, weke beşen 13-17an nîşanî me dide. Tiştê ku cîhana Kevokê serûbinê hev dike, wê dixe nav wê helwêsta sosretyê û herdu lehengan rûberî nîgara neçê dike, tarîtiya bêdewletbûn û bêkesbûnê ye...

Bi taybetî romana hunernûjen a ku şax vedide li ser darê cîhanê, pêwîst bû ku, em li ser vê romanê rabiwestin, cîmkê ev roman cihê vala dadigire û bingeha avahiya wêjeyeke Kurdî ya nûjen damezrine. Mehmed Uzun, ji aliyê karê wêjeyî û çandî ve xwediyê taybetî û hunereke mezin e. Ev nivîskar, di warê fantazî û teknîkê ve jî, ne kêmê Franz Kafka, Thomas Mann, Tojstoy, Dickens, Gabriyîl Garcia Marquyî ... ye.



Beriya ku ez vê romanê bixwînim, min romana Mehmed Uzunî ya bi navê "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" xwend û min nivîsek di derheqa wê de nivîsand û ew di kovara "Helwestê" de hat weşandin.

Tamxweşî, çêj, xoş û lezeta wê romanê di bin zimanê min de bû, min dest bi xwendina romana "Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê" kir", wê ez birim nav cîhana xwe, ez ketim nav şer û şoreşan, nav lorîna dayikan û girîna zarokan, wan

ez girtim û tifingê dan ser milê min û berê min dan Kurdistanê, ez çûm Kurdistanê, min li wir laşen şehîdan dîtin, bi hêviya dermankirina birînên wan, ez ji wekî Kevokê, li ser çiyan digeriyam, min dayikek dît, wê digot; “de lorî lorî lorî lorî kurê min”. Bi lorîna dengen wê, ez li xwe aqilim û min dît ku ez ji ser û cengan dûr im, li Swêdê me, lê bi şoreşa romana Uzunî, tifingê dabû ser milê min û berê min dabû Kurdistanê, li wir, min li dijî dijminên Kurd şer dikir. Ez li romanê vege riymam, min tê de, dît ku Welatê Çiyan dişewite, dar û berên wî dişewetin, gund dahlêñ wî, devî, daristanêñ wî, war û wargehêñ wî dişewitin..., ez di deriyê romanê de çûm nav refê şoreşê, min kirâsê gerilan li xwe kiribû û keleşkofek da ser milê xwe û min çavê çepê girt û çavê rastê li nîşanê gerand.

Romana Uzunî, romaneke nûjen e, neynika hundirê mirovî, psikolojiya hundirê mirovî, hest û têkoşîna hundirê mirovî dide dihîne zimanî.

### **MEHMED UZUN BI TENÊ YE**

Nivîsîna vê romanê; zorê dide me da ku em bibêjin; Mehmed Uzun hem hîmdarê romana kurdî ya hunernûjen e û hem ji hevalbendê Kafka, Mann, Tojstoy, Dickens, Gabriyêl Garsya Marquy, Balzac, Joyce û Hemîngwayî ye. Ew nivîskarekî neteweyî û navneteweyî ye. Ew pênuşşorekî piralî û zîrek e. Ji aliyeñ çand û wêjeyê ve, xwediyê taybetmendî û hunereke mezin û bi çandê ve tiji ye. Di derheqa hunera zimanê wêjeyî de zanîna xwe ya taybetî heye. Ji ber hindê, ew di nav nivîskarêñ hemdem de, bê şik yê rêza pêşîn e. Uzun xwedî sê zimanân e, lê ji tevan bêhtir bi kurdî romanêñ xwe dinivîsîne. Uzun endamê PEN KLÜBA Swêdê, Yekitiya Rojnamevanêñ Swêdê û Yekitiya Rojnamevanêñ Cîhanî ye. Ew birêvebirê Yekitiya Nivîskarêñ Swêdê bû. Herwisan ew li Wezareta Çandî ya Swêdê, wekî pisporê wêjeyêñ biyanî xebitiye û di amadekirina semînerên navneteweyî yêñ wêjeyî de ji wekî amadekar besdar bûye.

Uzun hemû romanêñ xwe li sûrgûnê nivîsîne, ew nivîskarekî sûrgûnê ye. Sûrgûn gelekî kesan pûç û vala kir, wan bêwar û bêziman kir, lê sûrgûr ji bo Uzunî, bû cih û warê afirandina zimanekî ku ber bi mirinê diçû, Uzunî ew ji mirinê azad kir û kir zimanekî wêjeyî û jîndan. Bi hebûna vê romanê, em dikarin bibêjin ku Romana Kurdî ya nûjen heye. Herçendî dereng mabe ji, ne xem e,

niha heye... Heger Uzun nebûye; Kurdistan çolekî bêdar û ber, çolekî rut, ziwa, hişk, cilmisî, pûyî, wekî darêñ bexçeyê yên bêav em li ber tavê hişk bûn, ava kahniyêñ me vemirî, ew ziwa...

Uzun ji bo zimanê kurdî dîrokeke nûh diafrîne. Ew nivîskarekî dogmatîk nîn e, divê em wî wek navneteweyî yê pêşîn dibînin. Ji xwe ev romana ku di destê we de, çirandina sînoran e. Mehmed Uzun pirhevoksaz û nêrengsaz e, ew zimanekî nûh diafirîne. Ew pispor û çêkerê yekemîn yê zimanê roman e. Yanê ew hîmdar û avakarê zimanê romanê yê modern e. Ew nivîskarekî navbervan e û bi du çavan bûyeran derbasî ser kaxizan dike. Ji ber hindê, ew wekî Sarte existentialist, humanist û mirovhez e. Yanê ew wehş û kirinêñ nemerovane daggeh dike.

Di romana wî ya nûh de vegetina teknîk û temayê bilind e. Ev yeka dihîle em bibêjin, Uzun zimanekî nûh diafrîne, ji ber hindê, hîmdar û avakarê romana Kurdî ya nûjen e û hem ji nivîskarekî navneteweyî ye. Uzun Joyceyê Kurd e yê ku pênuşsa xwe şoreşê dike. Romana wî dê cihê xwe di nav romanêñ cîhanê yê modern de bigire. Ew bi romana xwe, di sala 1998ê de, bû xwedî şohreteke mezin. Piştî nivîsîna vê romanê, ew ji qonaxekî re derbasî yeka din bû. Di vê dema me de bi pêşveçûna zanyariya dinyayê re û bi ictadêñ nûh re nêrin û dîtinêñ mirovêñ Kurd ji, ji binî ve guhêrîn. Uzun nûnerê dema niha ya tipik e, tê de diji. Ew dibîne ku di warê zanyariyê de riyêñ pir fireh li ber mirovahiyê vedibin. Ji ber hindê, ew dixwaze ku di hunera romana xwe de aliyeñ zanyarî ji hebe. Uzun diyar dide ku, gava ew di berhemêñ xwe de qala mirovekî bike, divê karaktera wî mirovî bi hawayekî zanistî şîrovebike. Ev ji bo serpêhatî û bûyeren “Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê” wî wisan e. Yanê bûyer û serpêhatî, bi ci hawayî û çîma dest pê dîkin, diqewimin û çîma pêşve diçin û bi ci hoyan dawiya wan dihêñ; divê ev tev bi metodêñ zanistî yêñ wêjeyî bihêne eşkerekirin û zelalkirin... Bi rastî Mehmed Uzun, van hîzir û bawerryen xwe di vê romanê xwe de bi kar hanîye. Wî, bi vê romanê, şopeke nûh damezrand û wêjeya kurdî ji propanganda û siyasînameyan rizgar kir. Wî bi qayde û hawayê dualîzma Mezobotamî ya kevn, mîna dualîzma Gilgamişî ya ku di derheqa mirin û jîyanê de ye, nivîsiye. Dualîzm di wêjeya nûh de ji cihekî girîng digire.

## ASTENGÊN LI PÊŞIYA NIVÎSKARI

Heger mirov qala astengên li pêşiya Uzunî bike, ew pir in. Ez nizanim ka hêja ye ku ez yek bi yek qala wan bikim? Lê yek ji wan, astengan; gelşa şerê kirêj, rastiya tahl û trajediya me ye ku pirîcaran hunerê vedigere û dide ber darê lêdan û kuştinê. Di şert û hoyên wisan de, dewsa ku mirov romanekê bedew pêk bîne, sloxanname, derdname, siyâşname dihê pêk. Ev tahlûke li ber Mehmed Uzunî ji hebû, lê ew biserket. Ev rastiyêن tahl yên gelê me, bê guman cihê xwe di vê romanê de digirin, lê bi hawayekî wêjeyî ku li romanê bêhnê neçikandine û roman nebûye warê

propangandaya siyasi ya partî û rôexistinan. Çimkê qeydên wêjeyê, nemaze yên hunera romanê, xwediyê zimanekî wêjeyî ye, zimanê romanê û zimanê perwergarî ji hev pir dûr in; roman ne rasterast berdevka bîrdozi û ramanan e, di vê romanê de bîrdozi, konevanî, têkoşîna nete-veyî û mesaj hene, lê ew bi cih û bergêن wêjeyî û hunerî hatine honandin û xemilandin.

### NAVEROK

Mehmed Uzun wekî kamerabanekî hovîtî, jakamî, dirindeyî û wehşeta ku li Welatê Çiyan dibe, dikişne, wan bûyeran, bi hawayekî zanistî dihonîne. Hinek berhemên kurdî wekî çoleke bê dar û ber, ziwa, rût û repal in. Lê ev roman ne wisan e. Em vebigerin ser hîzir û ramanen vê romanê, em tiştekî nûh, kûr û berfireh dibînin; berxwedan û têkçûnên Kurdan.

Naveroka romanê rojane ye, qala şerê Welatê Çiyan dike. Bi problemên civakê ve girêdayî ye. Ev berhem, berhemeke monoton nîn e, çimkê berhemeke monoton bala kesî nakişîne ser xwe. Ev roman bi bûyerên rojane ve tijî ye. Mehmed Uzun di vê romana xwe "Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê"de qala şerê rizgariya neteweyê Kurd yê ku li Welatê Çiyayan dibe, dike. Ew bi du çavan li bûyerên şerî mêze dike, yanê bi çavên herdu aliyan li şerî dinêhêre. "Welatê Çiyan" Kurdistan bixwe ye û "Welatê Mezin" Tirkîye, İran, İraq, Sûriye ye. Çend sal berî niha, Helepce bû hedefa êrîşen kîmyewî yên dewleta faşist a İraqê û 5000-7000- keç, jin kal û zarokên Kurd hatin şehîdkirin û bi hezaran jî hatin birîndarkirin û bi hezaran jî berê xwe dan çolistanê. Di romanê de, Uzun qala Welatê Çolê dike. Dibe ku "Welatê Çolê" Çolistana Kurdistanbaşûr be, dibe ku derekî din be jî. Çimkê bi

hezaran ji Helepceyê reviyan, li çolê, çiyan, newal çolistanê bi cih û war bûn. Dewleta İraqê di sala 1975ê hinek Kurdan súrgûnî Kewatê kiribû. Dibe çolistana Kewatê be. Dîsan, ev roman qala Kurdên ku ji bajarên Kurdistanê(Dersim, Axrî, Sasûn, Gelyê Zilan, Amedê)reviyane û paşê di dibistanê dijiminan de xwendine, dike, li ba wan xweînkarkirin heye û ew ji dijî neteweyê xwe derkevin, hene. Baz yek ji wan tîpan e. Dê û bavê wî di serhildaneke Kurdan de hatin kuştin û ew sêwî û bêxwedî mezin bûye, paşê bûye dostê dijiminê dê û bavê xwe.

Baz cil û du salî ye û Kevok bîst û du salî ye. Baz di zarok û piçûkahîya xwe de sêwî û bêxwedî mezin bûye û paşê dibe zabitê ordiya ku dijiminê dê, bav û kalikên wî bûne. Baz bi saya General Serdar dibe zabitekî binavûdeng û dîroka zaroktiya xwe înakar dike. Ew bi xwe hebûna welatê xwe qedexe dike, bi darê zorê binax dike. Ordoya Welatê Mezin, bi alikariya wî, welatê wî dike; warê şer û cengen, kuştin û hilweisnê... Bi gotineke din, jiyana dê û bav, pismam, ap û merovê xwe, cîhana zaroktiya xwe, li welatê xwe dike "gayrî meşrû".

Ev roman, ji serî ta dawiyê, du hawayên têkoşînan ango karekteran li ber çavan radixe, ku ew herdu jî li dijî hev in. Yanê di kesitiya qehremanen romanê Kevok, Rînas, Çekdar û Jîr de riya mafxaziya neteweyî, adaletxwazî heye û di kesitiya Baz û General Serdar de jî, xirabî, xwînxwerî, bêtolerensi, monoteîzm û yeknete-veyî heye. Ew zorker, zorbaz, hov, dilkevir, dilreq, dilhişk, nedilivan û bêinsaf e. Ev dualîzm di ola Zerdeşî û destana Gailgamiş de de cîyekî girîng digire.

Gernasê yekemîn Baz e, kokKurd e, lê bûye zabitê ordiya Tirk û gernasa duyemîn li bajarekî welatê Mezin(Tirkîyeyê) dimîne, navê wê Kevok e(keça awukat), ew zilm û zordariya dewleta Tirk nepejîrine û li dijî wê zilmê derdikeve ser çiyan; teví gerîlan dibe û berxwedaneke li ber çavan radixe. Herdu gernas jî hatine çêkirinê, sembolik in. Jîr, Rînas, û Çekdar jî, wek Kevokê ji Welatê Çiyan, sembola xweşî û azadiyê ne, ew li dijî Welatê Mezin(ordiya Tirk) şer dikin, dixwazin tola şehîdên xwe hilbidin, lê bisernakevin û dijiminê wan jî bisernekeve. Welatê wan di nav xwînê de ye, bûye gola xwîna şehîdan, lehengên ku di çiyan û newalan de dihê kuştin, laşen

wan, bêgor ji teyr û heywanan re bûye xwarin, dihê bîra wan û ew dixwazin bi şoreşke çekdarî Welatê Çiyan azad bikin. Ji lewra jî, Kevok dikeve nav refê şoreşê, di nav komek gerîlayî de cîhê xwe digire. Kevok di kesitiya xwe de şoreşekê çedike û diqulibe ser kesitiyeke nûh, miroveke nûh.

Di vê romanê de General Serdar heye, ew dîktatorenî mezin e; aqilmendê Baz e, lê li piştî Baz dijminê wî ye veşartîye. Ew hemû aliye jiyanê yên ronak û bedenê wê qedexe dike. General Serdar, li ba Baz dostê wî ye yekemîn û li piştî wî jî dijminê wî ye yekemîn e. Digel vê yekê jî, ji bo Baz, ordî, dewlet, netewe û ala dewletê, şan û şerefa wî ye. Baz bi çavekî mezin li General Serdar mîze dike, Xwedê li jor, li jér jî ew. Baz aîde, û kopiya wî ye, wekî wî dilive. Baz navekî qod e, navê wî ye rastîn ne diyar(di romanê de) e. Em du karakterên bingehîn dibînin, ku yek jê; karaktereke mirovhez, nerm û têgihiştî ye. Ev karakter di kesitî Kevok û Rênas de heye, dikare mirovahiyê biafrîne, lê bi sernakevin.

Di dawiya romanê de, gotinê Zabitê Simbelqîti, Bazî dide hizirandin. Ew mirovî kal dinyadîti ye. Baz û ew, herdu hûrhûr dipeyivin. Zabitê Simbelqît dibêje: " Bajar guherîn, kinc, cil û berg guherîn, tank û top, erebe û otomobil guherîn, balafir û telefon guherîn, lê insanan mîna xwe ma, rik, kîn û inada insanan herwekî xwe ma..."

Yanê dewlet û ordiya Tirk wekî xwe maye.

Baz baş guhdarî dike, dibêje: " Ez ketime bextê te, ji min re bibêje, bi qasî ku tê bîra te.

... Yanî tu dibêjî... yanî ez ji wan deran im...yanî bav û diya min, ne qezayeke trafîkê de mirin? Li wan deran... ez sêwî mam? Bav û diya min ji wan in? Ez ji wan im...?"

Baz sedema kuştina dê û bavê xwe dihizire. Mader qala cîhana dê û bavê wî(Welatê Çiyan), war û wargehîn wan dike, dîsan ew cihan li Bazî vedigere, rabûn û raniştin , tevgîr, ziman û çanda wê cihanê, Bazî ber bi xwe dikişîne, ev jiyan di zargonên fermî yê Welatê Mezin de qedexe ye. Baz di van rêzen jorîn de em têdigihîjin ku ew li Kurdiya xwe e, vedigere, hindî jî Welatê Çiyan e, ji Kurdistanê ye, lê pir dereng e..." ... yanî ez ji wan deran im....", dibêje. Kumê xiço li serê Piço, ne hat û ne diçû. Yanê kumê General Serdar li serê Bazî, ne hat û ne diçû serê wî.

Di romanê de bi navê Mader, jinek heye. Ev jî dostika Baz ya kerxaneyê ye, lê weke diya wî ye jî. Mader bi xwe allegorîk e, ne bi tenê bûyer û ziman allegorîk e. Mader bixwe xwediyê du karakteran e. Baz ji Maderê re wisan dibêje: " Ez dê ji te re tiştekî bibêjim, lê şas mebe, min dest bi xwendina şîran kiriye. Şîrên li ser aşq û sewdayê, şîrên ku qala evîne dikin..." Mader, hinekî şâşbûyî, " bi xêr be", dibêje, " ev jî tiştekî nûh el...Kurê min ê sêwî û şîr!". Ez têdigihîjim Mader hem diya wî û hem jî aqilmendê wî ye. Mader du mirov e, allegorîk e.

Em vegeerin ser Maderê, ew wisan dibêje: "...dinya bi dor e, ne bi zor e. Zor nikare dewsa dorê bigire. Rûyê bayekî gur, bi dereke din ve badî, an şevê bikî roj, dora wan biguherînî, stêr û heyvê biquilibînî ser tavê? Ruhê insanan jî weha ye. Ruh, bi zorê terbiye nabin... Ji ber ku nexweşîyeke weha ruh, dil û hîsên insanan derdixe pêş. Ji ber ku insan, heta niha, ji bo te, ne insanan bûn, jina te, zarokên te, ez jî tê de, em hemû, ji bo te, wasite bûn, alet bûn, diranên çerxa nêrin û qaydeyên te bûn, em hemû diranên kêra pergala mezin bûn, pergala ku tu jê re xizmetê dikî. Ji ber ku ji roja ku min tu nasî û vir ve, tu carî, te insanan, dil ruh û hîsên insanan nedît û te xwe nehêşand ku tu bibînî. Lê niha, tu dê bibînî. Ji ber ku taya evînê, tayeke hisî, tayeke insanî ye... Ji ber ku evîn, nexweşîyeke insanî ye, insanan dike insan...." Mader kelegirî dibe û nikare gotinê xwe dubare bikin. Em di van hevokên jorîn de dibînin ku derd û kulên Maderê giran û mezin e. Ew jî kêfê re neketiye Kerxaneyê. Mader bêgav dimîne. Sert û şûrtêni jiyînê wê ber bi Kerxaneyê ve kaş dikin. Yanê ew ji bêgava jiyanê ketiye kerxaneyê... Di dilê wê de mal, zar û zêc...

Di vê romanê de lehengên ku karakterên wan li dijberî hevûdu hene û di nav wan de têkoşîn û hîvî û bêhîvî, heye, hene. Karaktereke General Serdar heye; xwînrêjî, zilm û zordarî... Baz jî xwînrêj û zordar e, lê poşman dibe . "Yeşil" ê ku iro li Tirkîyê zahf tê peyivandin, dikare bibe Bazekî...

Em vebigerin ser Kevokê, keçen mîna wê pir in. Keçen serhildêr yêni di şerî de dîl dikevin û dikevin destenê dijminî pir in, bêhejmar in û paşê dîbin itîrafkar, cîh û stargehîn keleşan nîşanî leşkeran didin, pir in. Dîsan di vê romanê de Rênas heye, ew Kevokê ji mirinê rizgar dike. Ew

wê dide ser piştä xwe, ji sar û sermeyê azad dike. Gava ku Kevok dihê girtin stargeh û warên Rênas û keleşan ji Baz re dibêje. Rênas û hevalên xwe ji rûyê Kevokê ve dihêñ kuştin û girtin.

### Naveroka romanê kom dibe ser van xalan:

1)Kurd hezkarêñ tebiyetê ne; 2)tunebûna azadiya ramanî û çapemenî, 3)qedexekirina kovar, rojname pirtûkêñ kurdî; 4) qedexekirina partî, rêxistin, civîn...; 5) kesitiya Kevokê ya kevn û nûh ( porkurt, niha keleşkofeke lûlekurt li ser milê wê ye, li ser rûyê wê şopa krem û boyaxê nîn e, lê berê hebûye; 6)girtin û kuştina rewşenbîran, siyasetzan...;7)sırgûnkirina giregire, malmezinan, rewşenbîran, gundiyan; 8) qedexekirina mafêñ grep, lokawt, xwepêşandan, meş û civînan, hestêñ mirovane...; 9)evînî, dildarî ...; 10) problemê Bazî yên zaroktî, sêwîmayinê; 11) metodêñ işkenceyê; 12) sewitandina gundêñ Kurdan, rewşa kambax a niha; 13) li dijî têkoşîna neteweyê Kurd şerkirin; 14) yeknetewebûn û yekdewletbûn...

### WEKHEVIYA JIN Û MÊRAN

Neteweyê Kurd ji hebûna xwe û ta îro tu cihêtîne xistiye nav jin û mîran. Mehmed Uzun vê wekhevbûnê, bi lehenga xwe ya bi navê Kevokê îspat dike. Li gorî gotinêñ pêşîyan "şerşer e; ci jin e û ci mîr e"(di romanê de). Bi alîkariya vê gotinê, em dikarin bibêjin, wekheviya jin û mîrêñ Kurd hebûye, lê bi hatina ola Ereban ve winda bûye, miriye, olê kesitiya jinan nizm kiriye û bêrûmet kiriye. Ev roman pirekî nûh di navbera kevneşopî, adet û cihêñ jin û mîrêñ Kurdan de datîne û wekheviya wan bi hawayekî wêjeyî û çandî zelaltir dike. Di çanda me de gelek gotinêñ pêşîyan hene. Yek ji wan gotinan ev e: "Jina çê mirov dike wezir, jina xerab mirov dike rezil". Hemû jin jî ne wek hev in; hemû mîr jî ne wek hev in, mîrêñ baş hene, yên ne baş jî hene.

### KELEŞÊN WELATÊ ÇIYAN Û ORDIYA WELATÊ MEZIN

Dema mirov vê romanê dixwîne, mirov dibîne ku gelê me li ber xwe dide, şerê "an Kurdistan û an Kurdistanê" dide. Em serûçavêñ van probleman di jiyana gelê xwe ya rojane de jî dibînin. Di romanê de hertiştiguherin, lê dewleta Welatê Mezin weke xwe dimîne. Çima? Uzun hemû xirabî û metodêñ ne mirovane dike stûyê sistêm û

nîzama Welatê Mezin(Türkiye, İran, İraq û Sûriye). Ev dihê wateya ku xirabî û xwînrêjiya Baz jî, ji sistêmê dihê.

Cîhan guherîn, kinc û cil guherîn, mal û xanî, tank û top, kevir û xwelî guherîn, lê insanên Welatê Mezin mîna xwe ma, kîn û ïnada wan herwekî xwe ma. Ji ber hindê, zargonên wê xwe naguhirin. Di romanê de jî wekî xwe dimînin. Zargonên Welatê Mezin yên çandî, rêzanî, civakî û leşkerî li dijî rûmeta mirovan e, ew bêrûmetiyê diafrîne û ji lewra jî Baz û tevî ordiya xwe, li dijî mirovahiyê ne. Hebûna rûmetê jî girêdayê azadiya Welatê Çiyan e. Welatê Mezin ku demokratîyê pêk nehanîye, ji lewra jî leşker û ordiya wî dijiminê Welatê Çiyan e, ji bo welatê General Serdar hebûna rûmetê ne pêwîst e. Leşker û zabitêñ welatê wî ji mîjîyen xwe yên dema hovitîyê azad nebûne. Yanê General Serdar, dewlet û zabitêñ wê, tenê bi şekil û dirûvîn xwe yên fizikî ve mirov in; ew bi dil û mîjîyen xwe nemirov in.

KEVOK, RÊNAS û ÇEKDAR çavêñ xwe yên çepê digirin û çavêñ xwe yên rastê li nîşanê digerin Û BAZ û ordiya xwe çekêñ wan li milêñ wan mîna Dijlê û Firatê, pêrgî hevûdu dihêñ. KEVOK, RÊNAS û ÇEKDAR ji milekî, Baz û ordiya xwe jî li milekî, ew rûberî hev dibin. Şerekî giran dest pê dike, dê weledê xwe davêje. Di vî şerî de rewşa Kevokê û hevalêñ wê çawan e?

"Xanî, mal dişewitin. Derî, pencereyêñ xaniyan, banêñ wan ên bi ax û ka, axur û kadînêñ wan dest pê dikin û dişewitin. "Mala minê", Kevok dibêje..."

Hewş, heşf dişewitin. Dar, ber, dahl, devî dişewitin, giya, pûş dişewitin".

Em di van rêzêñ jorî de hestêñ Kevokê yên mirovane û bi derd û kul dibînin.

" Belê", Rênas dibêje, "meraq meke, heta helîpkopter werin, em di nav çiyan de ne..."

"Lê, em geleki dûrî çiyan in?


"Na, na, em xwe digihînin çiyan..."

"Hingî hazırî bikin, Baz... hedefa yekemîn Baz e. Kî dê lêbixe?

"Ez", Rênas dibêje, "ez ê bi guleyekê mîjîyen wî belav bikim."Şervan, bi lez, dest bi haziriya êrîşê dikin. Didu bi didu, sisê bi sisê, li der û dorêñ bilindahiyêñ giran , li cihêñ ku bi çeperan dişibin, rûdinin û lûleyêñ çekêñ xwe ber bi gund dikin."

**Dumahîk heye**

# BINERE ! ÇEMÊ FIRATÊ XWÎN DIHERIKE



"Yaşar Kemal dêwê edebiyatê ye."  
(André Clavel - Fransa)

"Yek ji wan ne ku di dema me de romana  
herî mezin afirandiye."  
(Le Monde - Fransa)

"Yaşa Kemal romannivîserê herî mezin yê  
sedsalîya me ye."  
(Rojnameya Europe)


"Yaşar Kemal gotubêjekî herî mezin ya cîhana  
nûjen e. Xwendina berhemên wî, jiyanê fêmkirin  
e. Ew, wek lehengekî bê tîrs dinivîse."  
(John Berger - Britanîa)

Li Tirkîyê peyva "Kurdistan" qedexe ye. Dewleta gadirker a Tirk bi zagonên xwe yên nijadperest û şoven navê Kurdistanê qedexe kirine. Weşanên Kurdan wexta behsa Kurdistanê dikin, sirf ji bo peyva "Kurdistan" ji alî dadgehê ve têne qedexekirin, polîs diçin wan weşanan dicivînin ser hev û digrin dibin, berpirsiyarên weşanan jî ji alî dadgehê ve têne cezakirin.

Yaşar Kemal di romana xwe ya dawîn "Binere! Çemê Firatê Xwîn Diherike" de gelek caran peyva Kurdistanê bi maneya xwe ya eslî, bi maneya welitekî -welatê Kurdan- dinivîse. Yaşar Kemal bi

şêweyeke gelek baş pesnê zimanê Kurdî dide. Ew zimanê Kurdî gelek baş dinirxîne. Zimanê Kurdî zi maneke dewlemend û germ dipesîne û qîmeteke giranbiha dide zimanê Kurdî.

Senar Şahîn



Yaşar Kemal di vê romana xwe de bi zimanekî edebî qetîlama Kurdên Yezîdî qal dike. Ew hem qetîlama Kurdên Yezîdî behs dike û hem jî behsa ola wan dike. Behsa pîroziya Laleşê dike. Gelek pesnê Kurdên Yezîdî dide ku, ji ber ewqas zilm û tehdayê, ji ber ewqas qetîlamân Kurdên Yezîdî hêj jî li ser piyanin, hebûna xwe û tradisyonâ xwe ya olî û kulturî didomînin.

Yaşar Kemal di vê romanê de ji bo Yezîyên Kurd weha dibêje:

"Yezîdî bi sedsalane ku êş dikşînin, têne kuştin.... Bi salane kuştin û qetîama Yezîdîyan dom dike. Li çolan, li mixaran li çiyan digerin ji bo ku Yezîdîyek bibînin û bukijin. Jin, zarok, keçen ciwan, xort kî bi destê wan bikeve dikujin. Lê dîsa jî Yezîdî naqedîn, di berxwede didin..... Dicin Laleşê rûyê xwe di dergeha Şêx Adî Bîn Mîsafîr de didin, tewaf dîbin..... Dibêjin evana bi Şeytan, bi Rojê, bi Axê û bi Agir bawer dîkin. Ew Şeytên ku li hemberê xwedê serî hildaye. Kî Şeytan dîye? Kî çûye cem xwedê? Ji alîkî ve mirov binêre Yezîdî bi heq in. Yê afîrîker, yê ku tiştan dixûlqîne Ax e, Roj e, Av e, Ba ye, hewa ye. Yezîdî berê xwe didin Rojê û dua dîkin. Bi sedsalan e ev însan hatin kuştin, hatin koçkirin, ewqas işkence dîtin, lê dîsa jî xwe netewandin, serê xwe xwar nekirin, serîhîdan, berxwededen, neqedîyan..... Ew di çiyan de wek teyrê Baz dijîn..... Zimanê wan Kurdî ye. Kurdî zimanêke pir dewlemend e.... Min di wan çiyan de germahîya zimanê Kurdî, ronahîya dilê însanan, ronahîya evînê dît."

Yaşar Kemal di romanê de behsa şerê Sarîqamîşê -Navçeya Erzeromê ye- ku di nabeyna ordiya Rus û Osmaniyan de çêbû, dike û encama şer li herêmê çawan bi xwe re xirabî, qetîam, wêrankirin û kawilkirina gundêne Kurdistan û koçberiya gundiyyêne Kurd dike. Yaşar Kemal bi devê Şêxekî wexta behsa qetîama Kurdên Yezîdî dike, dibêje "Binêre! Çemê Fîratê Xwîn Diherike." Roman navê xwe ji vê gotinê digre.

Xwendevanê delal!

Nivîskarê navdar yê kokkurd Yaşar Kemal bi vê romana xwe dîsa derket pêşberê xwendevanan. Yaşar Kemal di edebiyatê de hosta ye. Ew çîrokvanek bê hempa ye. Ew wexta ku behsa bûyerek dike û wê bûyerê dinivîse, bûyerê bi hostatî û bi teferuatian lihev dihune û wesan xweş dinexşîne ku mirov ji xwendinê têr nabe.

Berhemên Yaşar Kemal berhemên yek kulturek nîn e. Ew ji ber gelek kulturan berhemên xwe diafrîne. Lê, ew bi piranî di bin tesîra kultura Kurdî de, di

bin tesîra dengbêjên Kurd de maye. Edebiyata devkî ya Kurdî tesîrek mezin li ser wî kirîye û vê tesîrê xwe di berhemên wî de ji daye xuyakirin. Ji bo ku mirov ji Yaşar Kemal û berhemên wî fêm bike; divê mirov ji Hemîngway, Faulkner, Homeros û destanên Kurdî fêm bike.

Yaşar Kemal di qalkirinê de metodek wisan bi kar tîne ku; ew deqîqeyek dike sedsal, sedsalan dike dem ek. Ew, carna di gelek rûpelan de gulek, gi-hayek qal dike. Carna rêveçûna hespek di deh rûpelan de têt behskirin. Hevokên wî kin û kurt in, lê bi lez û bez in. Di qalkirina wî de sihir heye ku mirov radipêce.



Yaşar Kemal di vê romana xwe ya bi navê "Binêre Çemê Fîratê Xwîn diherike" de behsa şer û koçberiyê dike. Şer bi xwe re wêrankirin û koçberiyê tîne. Hestê tolhîdanê ges dike. Kîn û xerezê dixe dilê mirov. Yaşar Kemal di vê berhemâ xwe de hêviyek dide mirov ku dê dem bê mirovahî zora hest û daxwazên şer û şervaniyê bibe û şer ji nav însaniyetê rabe. Ew dibêje "mirovahî pir kevnare ye, qedîm e. Bi milyonan însen bi milyonan dîtin û raman afirandine. Îro însan di cîhanê de bi qasê ku bi însan dizane bi tiştek din nizane. Însan ji dema ku bûye însan heta îro ji şer erjengî bûye, zariyaye, lê dîsa jî kuştiye. Mirovok çiqasî êş bikşîne hemû mirovahî ewqas êşê dikşîne. Bi mirovok re hemû mirovahî tê kuştin. Li dij şer şerkirin, li dij kuştinê şerkirin ramana herî baş û xweş e ku di vî axê de hatiye afirandin."

Romanên Yaşar Kemal kurtebehskirina destanêن êş, elem, kîn, qehr, kerb û xişima mirovahiyê ye. Lehengêن berhemêن wî gelek êş û elem dikşînin. Di vê romanâ xwe de nivîskar li ser yên ku êş û elemê bi hinekan didin kişandin disekine. Ew li ser guher-tina însanan disekine. Büyera vê romanê di giravêk de derbas dibe. Girava kirmoriyan. Ji vê giravê koçberiya Ruman - Grekîyan- tê qalkirin. Ev girav cihê xweşiya xwezayê û cihê bereketê ye. Girav sîmgeyek e. Yekê ku di şer de talankarî bike, talanker be, dê di giravêk weha de çi bike? Nakokîyen di nav wî û di nav ronişvanêن giravê de, dê çawan be?



Jiyandina şer, wakiayek e, fenomenek e, ku mirov pê digehure. Yê ku şer dibîne û di nav şer de dijî, hindî însanê berê, însanê dema çûyî nîn e. Ev pozitifistî bi devê qaymaqam weha têt gotin "Em hemû ji agir derketin. Ji agir em hemû şewîfîn, dilên me perçe perçe bû. Em birîndar bûn. Me însanîyeta xwe wenda kir, digot Dr. Xelî Nurî... Însanîyeta me çû, xweliya me ma. Hingê em însanê berê yên bi sîhet nîn in. Zarokên me ji hendî wek însanê berê nabin. Newîyê me ji... Hetanî qîyametê dê xwîn li ser wan bibare. Biîndar, nîv dîn, dê hevûdu bixwin. Dê hesîtê xwe yê mirovahiyê hunda bikin, ronahîya hundirê wan dê bê tefantin, weha dê biggerin, çavên hevûdu derxin..." Lê ev guherîn divê tenê ber bi xirabiyê ve be? Însan divê însaneşîya xwe wenda bike? Munaqeşeya vê tişî di vê romanê de heye. Şerê Sarîqamîşê û têkçûna wê di vê romanê de ye. Ev roman dide xuyakirin ku; mirov digehure û dige-

hurîne. Heger mirov bixwaze her roj bi rojê re ji nû ve jîn bide, heger mirov bixwaze xwe ji hemû xirabiyen biparêze, heger mirov bixwaze xwe ji hemû hesûdiyan pîrûpak bike, wê gavê mirov ji nûh ve dijî, zînde dibe.

Mirov zarokê şanzdeh salî bixe nav şer, bişîne qada şer têt efukirin? Ew şerê ku mirov perîşan dike, tirs û xofê dixe ruhê mirov, tırsa mirinê dixe laşê mirov. Ew şerê ku çiyê mirov hebe, bi xwe re dibe, mal û milkê mirov talan dibe, tenê dilê mirov tazî dihêle. Yêñ dimirin, dimrin, yên dimînin perçe, perçe lîme dibin. Tenê tirs dimîne. Mirov tırsê wenda nake. Heger mirov tırsê ji wenda bike, wê demê dilê mirov çawan dibe?

Yaşar Kemal di vê romanê de behsa gelek efsaneyen eşkiyâ û derwîşan ji dike. Ji xwe mirov dikare bibêje ku; ev roman destana însanane, destana mirovahiyê ye. Însan ku wek avê, wek axê, wek tîrêjên ronahîyê naqede, narize, namire. Însanê qilêr û yên ku hatine qirêjkirin û yên ku xwe nûhkirine. Însan gava hevûdu dikujin, bi xwe re xwezayê ji dikujin, naturê qirêj dikan. Çemê Firatê bi rojan bi cesedê însanan tije dibe. Çemê Firadê xwîn diherikîne. Çemê Dicleyê-Tigrîs- bi mi-riyan tijî dibe. Ji şer çi dimîne? Pişî şer ji parve çi dimîne? Birçîflî, perîşanî, tunebûnî, tîfo, gundêñ wîran, qeza û bajarêñ xirabkirî, darîstanêñ şewîfî, ji şerî hetanî binî welatekî xirabkirî. Mirovén seqet, birîndar û dîn. Ev hemû tiş di vê romanê de heye.

Yaşar Kemal di vê romanê de destana têkoşîna însan bi însan re, însan bi xwezayê re nivîsiye. Ew di romanâ xwe de pesnê dostaniyê dide. Dostaniya ku divê di nav netewe û gelên cuda de divê pêk bê. Ew pesnê keda însanan dide, qîmetek gi-ranbiha dide keda mirovan. Fona romana wî mozaîka gelên li Anadoliyê ye, gelên Mezopotamîyayê ye. Mozaîka malbatêñ Anadoliyê û Mezo-potamyayê ye. Mozaîka jîn û mîran e. Mîr Kafkasî ye, jîn Asurî ye. Mîr Kurd e, jîn Azerî ye, mîr Tirk e, jîn Ereb e.

Di berhemêن Yaşar Kemal de, êş û bextîyariya hezar salan heye. Hêvî û ronahîya pêşerojê heye. Xwendevanêñ edebîyatbez divê berhemêن wî bixwînin.

# Romana Sirgûnê

## “BIRANİNÊN JI MALA MİRÎ”

X. Helwest

Dostoyevskî vê romanê di sircûnê de, di Sibîryayê de dîniyîse. Dostoyevskî di hepisxana bajara Omsk'ê de 8 sal radize. Paşê wî sircûnê Semîpalatînsk'ê - Sibîryayê- dîkin. Li wir li ser vê romana xwe dixebite. Ew li gor tecrûbeyên xwe û tiştên ku di hepisxanê de dîtiye, bihîstiye û tiştên ku hatine serê girtiy-an ji hêla sosyolojîk û psîkolojîk nirkandiye û pîvanên exlaqiyê bi kar anîye. Ew di berhemâ xwe de tabloyên girtiyan ku ewqas di şert û şûtên zor de dijîn li ber çavan radixe. Dostoyevskî di vê berhemâ xwe de li hember girtiyan mirovhiz e, humanîst e. Ew vê rastiyê diparêze; yê sucdar jî mirov e. Ew çiqas ta-wanbar be jî divê mirov bi çavên mirovîyê lê binêre.

Romana bi navê “Bîranînê Ji Mala Mirî” pêşî di kovara “Vremya” yê de di salên 1861 - 1862'an de hatiye weşandin. Paşê ev berhem bi gelek zimanên cîhanê hatiye wergerandin û di wan welatan de hatiye weşandinê. Li tirkîyê jî 4 car bi wergêriya kesên cuda hatiye

wergerandin û weşandinê. Lê ci heyfe ku hêj ev berhem bi Kurdî nehatiye wergerandin û weşandin.

Dostoyevskî romanê ji du beşan pêk anîye. Herdu beş jî di nav xwe de dibin bîst û yek - 21- beş. Di destpêka romanê de yê ku behsa romanê dike bi pêşkêsiyek baş qala romanê dike, wê pêşkêş dike. Yê pêşkêşvan di Sibîryayê de bi navê Aleksandr Petroviç Goryançikov mirovek nas dike. Aleksandr Petroviç ji malbatek arîstokrat e. Ew ji bo ku jina xwe dikuje wî dixin hepisê û paşê sircûnê Sibîryayê dîkin. Ew di bajara K.'yê de bi cîh û war dibe. Aleksandr Petroviç di vê bajarê de dersa zimanê Frensî dide zarokên arîstokratan. Ew jiyanâ xwe bi pereyên ku ji bo mamostetiya zimanê Frensî qezenç dike, didomîne.

Aleksandr Petroviç mirovekî ku naxwaze bi însanan re biaxife, têkilî bi kesek re danayne, ji derve re girtî, bi tenêtiya xwe razî ye û tim li malê ye. Di malê de hetanî serê sibê hinek tiştan dike, lê kesek nizane ew di malê de ci

dike. Ji bo vê jî, gelek kes dibêjin ew dîn e, bê hiş û bê eqil e, mirovek xerîb e. Di derheqê wî de gelek dedîqodî -paşgotin- tên gerandin. Ev paşgotinên ku ji bo Aleksandr Petroviç tê gerandin balkêsiya pêşkêşvan jî dikşîne. Ji bo vê ew dixwaze bi Aleksandr Petroviç re dîalog daynê. Lê bi ser nakeve. Pêşkêşvan ji bajêr diçe cihek din li wir sê meh dimîne û paşê ve-digere. Pê dihese ku Aleksandr Petroviç di nav tenêtiyê de miriye. Diçe mala wî, pere dide xwediyê xanî û jê nivîsên Aleksandr Petroviç dikire. Beşek nivîsên Aleksandr Petroviç di derbarê dema ku ew mehkûmê bêrkişandina keştiyê buye, dema ku di hepisê de buye, beşa din jî di derbarê sehneyên ji mala mirî de ye.

**D**î esasê xwe de Aleksandr Petroviç Dostoyevskî bi xwe ye. Tiştên ku di berhemê de têt qalkirin, tiştên ku Dostoyevskî bi xwe qal dike ye. Mirov vê rastiyê dikare jiyanı Dostoyevskî û tiştên ku têt qalkirin bide berhev û bibîne. Dostoyevskî bi devê Aleksandr Petroviç jiyanı mehkûmê hepisxaneyê dide qalkirin. Ew wexta ku di vê berhema xwe de behsa tiştan dike bi pîvan û metodên realist bi kar tîne. Nivîskarekî Frensî-Andre Gîde - Jiyan û Berhemên Dostoyevskî- ji bo Dostoyevskî dibêje: "Berhemên Dostoyevskî berhemên ku bi bûyerên ramanî ve têne berkirin in..... Berhemên wî di nav teoriyê de na, lê di nav bûyerên rasteqîn de dimînin. Sahneyên realist yên romanên wî, yên ku bi qalkirina bi maneyên psîkolojîk û exlaqî ve hatine dagirtin in."

Wek ku di rêzên destpêkê de jî hate gotin; Li gor dîtin û ramanên Dostoyevskî yê sucdr jî mirov e. Ew çiqas tawanbar be jî divê mirov

bi çavên mirovîyê lê binêre. Ev tişt rastiyek zelal e. Binêrin, ferzkin yekî ku zarokan bikuje mehkumekî canî ye. Lê ew jî mirov e. Wek her mirovî xeyalên wî, tirsên wî, bextiyariyên wî, eş û derdên wî û hêvîyên wî jî hene. Di berhemê de behsa amadekirina Pas-kalya û Noelê têt kirin. Mirov dibîne ku; yên mehkûm çiqas bi hewes xwe ji bo cejna Noelê amade dikan. Mehkûm bi vê xweamadekirina çejnê xwe wek yên derve, yên ne girtî, xwe wek mirovan dibînin, weha xwe hîs dikan.

**Y**ên ku bi jiyan û berhemên Dostoyevskî hayîdarin, dizanın ku ew çiqas zor tê fêmkirin. Yên ku li Dostoyevskî bigerin wî dikarin tenê di nav berhemên wî de bibînin. Dostoyevskî jiyanek sirgûniyê jîya. Gelek gilî û gazînên wî ji bo sirgûniyê hebû.

Aleksandr Petroviç mirovek arîstokrat û rewşenbîr e. Bîranînên xwe dînivîse. Ji jiyan hepisxaneyê gelek gilî û gazîn dike. Lê qala hinek tiştên wê yên baş jî dike. Mesela dibêje "Ez di hepisxaneyê de qet bi tenê nemam. Li wir mirov tenê nîn e." Ew dibêje ku di hepisxanê de mirov mecbûre fêrê gelek tiştan bibe. Mehkûm ji bo hêvîya ku dê rojek cezayê xwe biqedînin û derkevin derve, bigihîn azadiya xwe, hemû derd û kulên hepsê dikşînin.

Dostoyevskî bi vê berhema xwe dîtinên xwe yên di derbarê mehkûmîyê û sirgûniyê de pêşkêşê xwendevanan dike. Ev dîtin û ramanên wî hêj jî rastiya xwe didomînin.

# Şêxê Çiya : Hasan Sabah

*K. Helwest*

Li ser jiyana nivîskarê romanê agahdarîyek kurt: Freidoune Sahebjam nivîskarekî ûnî ye. Ew dîplomatekî kevn e û niha li Parisê dijî. Freidoune Sahebjam berhemên xwe bi zimanê Fransî dinivîse. Ji bo ku di rojnameyên Fransê, Le Figaro û Le Monde'ye de nivîsên siyasi yên li dij fundamentalizmê nivîsi xîshima rejima ûnî ya fundamentalist kîşand ser xwe. Rejima molayên ûnî ji bo wî bîryara kuştinê derxistin. Her çiqas rejima ûnî ji bo wî fermana idamê derbixin jî, ew natirse û bîr û baweriyên xwe, dîtin û ramanên xwe hêj jî dinivîse. Freidoune Sahebjam gelek berhem afirandiye. Gelek berhemên wî yên edebî û pirtûkên wî yên siyasi hene. Hinek ji wan ev in: L'Iran des Pahlavis - Ûrana Pehlevîyan, Hussein de Jordanie - Melîkê Urdunê Huseyîn, L'Iran vers L'an 2000 - Ber bi salên du hezâri ve Ûrân, Le Femme lapidée - Jina Ricimkirî. Şêxê Çiya : Hasan Sabah.

## Naveroka Romanê

Ev romana wî ya bi navê Şêxê Çiya : Hasan Sabah, li ser sê mirovên navdar yên dîrokî, Nîzamûlmûlk, Omer Xayam û Şêx Hasan Sabah hatiye hunandin. Van hersê mirovan di dibîstanê de bi hevre mekteb xwendine. Paşê Nîzamûlmûlk dibe serok wezîrê împaratoriya Selçûkiyan, Omer Xayam dibe şairekî bi navûdeng û navdar. Hasan Sabah jî dibe şêzekî tarîqateke fanatîk. Di vê romanê de "îhtîras" û "Fanatîzm" heye. Terora fundamentalîstên İslâmî heye.

Hasan Sabah di sala di sala 1056'an de ji dayik dibe û di sala 1124'an de diçe ser heqiya xwe, dimire. Hasan Sabah kela Alamutê zeft dike û hetanî dawiya jiyana xwe di wê keleyê de dijî. Hasan sabah û mirûdên wî di keleya Alamutê de jiyana komûnê dijîn. Hasan sabah bi mûridên xwe Haşhaş - Afyon- dide kîşandinê û bi wan

gelek çalakî dide kirin. Hasan Sabah dijminê dagirkerê Selçûkî ye. Selçûkiyan ûnî dagir kirine, Hasan Sabah li dij vê dagirkeriya wan têdikoşe. Nîzamûlmûlk bi eslê xwe Faris e, lê ew bûye serokwezîrê împaratoriya Selçûkiyan. Hasan Sabah li dijê Nîzamûlmûlk e jî. Ew dibêje; divê mirovek ûnî, esilzade, aryan ji Turaniyan re xizmet neka. Nîzamûlmûlk di dema ku di dibîstanê de bû digot ûnî aryan in, serbilind in, niha jî diçe ji barbarê turanî re xulamî dike. Bi emrên Hasan Sabah, mirûdên wî bi şêweya suîqastê bi hezaran mirov dikujin. Ew terorek wisan pêk tînin ku gund û bajarê Selçûkiyan dikin berma xwînê. Fedaîyên Hasan Sabah, sultanê Selçûkiyan Melîksah û bi sedan serbaz û serhengên ordiya Selçûkiyan dikujin. Fedaiyên Hasan Sabah, bi suîqastek Nîzamûlmûlk jî dikujin.

Nivîskarê romanê her çiqas romanê li ser hîmîn bûyerên rasteqîn afirandiye jî, di qalkirinê de wî romanê bi hawayê mîstîk rapêçandîye. Li gorî qalkirina nivîskarê romanê Hasan sabah wexta ku dikeve tengasiyê her tim "dengek" tê pê û jê re dibêje ku ew dê çi bike, çawan bike, çawan tevbigere. Di romanê de şêweya "efsaneyê" jî hatiye pêkanîn. Jiyana Hanan Sabah, Nîzamûlmûlk û Omer Xeyam wek efsaneyê têt qalkirin.

Mirov wexta ku li rewşa ûnî ya İroyîn dinire, dibêje qey tovên wê di sedsala 11'an de hatiye avêtin. Hasan Sabah wek prototîpê Ayetullah û molayên Ûraniyan e. Tarîqata Batînî ji alî Hasan Sabah ve hatiye belavkirin. Di hîmî vê tarîkatê de xwîn heye, teror heye. Mirov dikare bibêje ku bapîrêj Xizbullahçîyên İroyîn Batînîyên doyîn in. Ji bo ku mirov rewşa rojhilata navîn baş bizanibe û kîrinê rejima ûnî yên terorîst fêm bike, divê mirov vê pirtûkê bixwîne.

# Sven O Bergkvist û Romanâ Wî

K. Helwest

Sven O Bergkvist nivîskarekî Swêdî ye. Ew di sala 1927'an de li bakûrê Swêdê hatiye dinê. Piştî xwendina dibîstanê dest bi karkeriya darîstanê dike. Di fabrîqeya daran de kar dike. Deh sal di fabrîqê de dixebite û nexweş dikeve. Nexweşîya wî nexweşîya weremê ye. Di nexweşxaneyê de gelek radize, tedawî dibe.

Romanâ wî ya yekem: Vandring till Ljusbacke -Rêveçûna Ljusbacke'yê ye-. Ew di vê romanâ xwe de pêvajoya deh saliya karkeriya xwe û rewşa karkerên fabrîqayê dinivîse. Di berhemên Sven O Bergkvist de paştemayîna bakûrê Swêdê, rewşa karker, gundî û xebat-karêñ çiftlikan, jiyan û têkoşîna wan bi zimanek edebî têt qalkirin. Sven O Bergkvist di berhemên xwe de zimanê gelêrî bi kar tîne. Ew bi zimanek sivik û hêsan, zimanek ku hemû xwendevan bi hêsanî jê fêm dikin, dinivîse.

Sven O Bergkvist di gelek kovar û rojnamey-an de nivîs, meqale dinivîse. Gelek pîyes û şanoyêñ wî di Televîzyonê de hatine leyistin. Wî 40 pirtûk nivîsiye û weşandîye. Gelek xelatêñ taybetî wergirtiye. Li Swêdê di nav nivîskarêñ karker de yê herî navdar Sven O Bergkvist e.

Niha ez dê bi kurtahî romana wî ya bi navê "Serîhildana Ezmên" binîrxînim. Ev roman romana têkoşîna çîna karkeran ne. Romanek çînî ye. Tê de yên serdest, kapîtalîst hene. Li hemberê kapîtalîstan karker hene, têkoşîna şoreşgerî heye. Di vê romanê de mirovên ku di ciwaniya xwe de jî û di kaliya xwe de jî sosyalîst in, hene.

Ev romanâ Sven O Bergkvist wek belavokek siyasî ye. Belavokek siyasî ku bi gotinêñ edebî hatiye honandin. Roman romanek bi heyecan e, balkêş e û serkeftî ye. Bûyerên romanê di nav karkerên fabrîqayê û li der dora fabrîqayê diqewime. Di romanê de, çawan li bakûrê Swêdê dewlemendîya şexsî pêşve diçe, feqîrî û belengaziya civaka karkerên fabrîqayê û dewlembûna kapîtalîstan ku her diçe zengînîya wan zêde dibe di romanê de tê neqîsandin, bi zimanek herîkbar têt qalkirin.

Sven O Bergkvist meslegê xwe yê roman-nivîserîyê gelek baş pêk tîne. Dilê wî her tim li ber karkeran lê dixe. Ew li gor bîr û bawerîya xwe ya sosyalîstî tevdigere û dinivîse. Loma jî di vê romanâ wî de berxwedan heye, teslîmbûnî qet tune ye. Li hemberê burokrasiyê têkoşînek mezin têt dayin. Romanek jîndar e. Leheng û figurên romanê bi hostatî hatine xuliqandin.

# JI WEŞANÊN NÛ

- 1 -

## Kovara Helwest

**E**m dixwazin di her hejmara kovara Helwestê de cîh bidin danasîna weşanên nû. Daxwaza kovara Helwestê yek jê ew e ku; di nav xwendevanên xwe de diyalogên germ dayne, ji bo têkîlî û diyalogê bibe pirek û xwendevanan bi berhemên nivîskarêni Kurd hayidar bike. Hetanî niha, di gelek deman de nivîskarêni Kurd berhem derxistine, lê îmkanên wan ewqas tunebûye ku nivîskar û ronakbîrêni Kurd yên din bi berhemên xwe hayidar bikin. Kovara Helwest ji bo vê îmkaneke baş e ku dikare vê wezîfeya danasîna pirtûkêni nû pêk bîne. Yênu ku pirtûkêni nû diweşînin bila yekê ji adresa kovara Helwestê re bişînin ku em wê bidin danasînê. Ne hemû be ji, gelek nivîskar û ronakbîrêni Kurd aboneyêni kovara Helwestê ne. Bila bi riya kovarê hemû kes ji berhemên nû hayidar bibin. Kovara Helwest li benda berhemên nû ye.

Em li jêr hinek pirtûkêni ku nû derketine û hejmarêni dawîn yên du kovarêni Kurdi bi xwendevanên xwe didin danasînê.

Kovara Helwest

Pirtûka Perwîz Cîhanî  
“Ax Şilêrok”

Perwîz Cîhanî nivîskarekî Kurd e. Ji Kurdistanâ Rojhîlat e. Ew li Kurdistanâ İranê kovareke kulturî ya bi navê “SÎRWE” derdixe. Di dema ku rojnameya “Kurdistan Press” weşana xwe didomandin kurteçirokeke Perwîz Cîhanî di Kurdistan Pressê de derçû. Ev kurteçirok li ser şerê birakûjiyê bû. Di pêşbirika kurteçirokan de vê kurteçirokê xelata yekem girt e.

Pirtûka bi navê “Ax Şilêrok” berhemeke edebî ye. Helbesteke gelek dirêj e. Perwîz Cîhanî ji bo pirtûka xwe ya helbestê pêşgonineke ji nivîsiye. Ew di pêşgotinê de li ser têkiliyê Kurdan û Azeriyan disekine û behsa Kurdên ku ji alî Azeriyan ve hatine asîmîlekirin dike. Gotinê balkê dibêje.

Ev helbesta dirêj 167 bend in. Di dawiya pirtûkê de beşa ferheng û şîrovekirinê heye. Di helbestê de dagirkirina Kurdistanê, ês û azara ku gelê Kurd ji dirêjiya mêtûjîye da li destê zordar û dagirkeran

dîtiye û dibîne destnîşan dike. Navê şilêlok jî ji navê zozaneke Kurdistanê ye. Ev zozan zozanê gundê Balasora jêrîn e ku li ser bajarê Xoyê ye.


Perwîz Cîhanî hinek besên helbesta "Ax Şilêrok"ê di kovara SÎRWE hejmara 12 û 13ê de weşandiye. Lê ji ber sansora dewletê nikaribûye hemê bendê helbestê biweşîne. Ji xwe ji pêşgotinê jî diyar dibe ku li ser kovara SÎRWE sansora dewleta Îranê heye.

Pirtûka Perwîz Cîhanî 64 rûpel e û di nav weşanên Apec de, li Swêdê derketiye.

### **"Ji Nav Edebiyata Swêdê"**

**Amadekar : Lokman Polat**  
**Weşanên Helwest - Çanda Nûjen**


Ev cara yekem e ku bi zimanê Kurdî -bi zaravayê Kurmancî- pirtûkeke li ser edebiyata Swêdê derdi-keve. Amadekarê pirtûkê Lokman Polat e. Pirtûk 120 rûpel e û di nav weşanên Helwest - Çanda Nûjen de derketiye.



Di pirtûka bi navê "Ji Nav Edebiyata Swêdê" de kurtejiyan û analîza berhemên 23 nivîskaren Swêdî hene. Li ser helbesta hevdem ya Swêdê jî

nivîseke analîzê heye. Hinek kurteçîrok û tekstên nivîskaren Swêdiyan jî hatine wergerandin û di nav vê pirtûkê de cih girtine. Di dawiya pirtûkê de jî hevpeyvîneke bi redaktorê kovara "Författaren - Nivîskar" Maria Radîkova re heye.

### **Weyla Licê, Weyla Licê "Dîroka Bîranîna Şehîdan"**



Ev pirtûk wek destana hemû şehîden Kurdistanê hatiye amadekirin. Di vê pirtûkê de li ser xirabkîrin, şewitandin û qetlîama navça Licê hatiye sekînandin. Nivîskar bi zimanekî lîrîk û têr û têje edebî qetlîama navça Licê tîne zimên. Nivîskarê pirtûkê Dilpêt Jêlî ye. Adil Duran ji bo pirtûkê pêşgotineke nivîsiye. Pirtûk 95 rûpel e û di nav weşanên Helwest - Çanda Nûjen de derketiye.

Berhemên weha bi nirx in, bi qîmet in, giranbihâne. Nivîskarê pirtûkê ji kezeba xwe zariyaye, bi dil û can êşa gelê Kurd haniye zimên. Dilpêt Jêlî mirovekî welatparêz e û ji ber bîr û baweriyêne xwe yêne Kurdperweriyê di zîndanên dagirkirêne Tîrkan de bi salan razaye. Ew hêj jî ji bo azadiya gel û rizgariya welat têdikoşe.

**SEYH SAIT İSYANI**  
(Serîhildana Şêx Seîd)  
Behcet Cemal  
Weşanên Jîndan

Behcet Cemal nivîskarekî Kemalist e. Wî li gorî îdeolojiya fermî -Kemalîzm- serîhildana Şêx Seîd nîxandiye. Wî ji ber belgeyên fermî yên dewleta komara Tirkîyê vê pirtûkê amade kiriye. Pirtûk cara yekem ji vir 43 sal berê, di sala 1955ê de ji alî "Weşanên Kutupxaneya Ataturk" ve hatiye weşandin. Weşanxaneya Jîndan pirtûkê wek belgeyeke dîrokî yên Kemalîstan ji nû ve weşandiye. Weşanxaneyê di pirtûkê de tu guhertin çênekiriye, pirtûkê wek eslê wê weşandiye. Tenê di berga dawî de li ser navê weşanxaneya Jîndanê ev gotin hatine nivîsin: "Ev pirtûk di dema tevgera rizgariya netewî ya Kurd a sala 1925ê de, notên ku ji alî generalên Tirk ve hatine nivîsin in."



Di vê pirtûkê de belgeyên dadgeha komara Tirk a li Amedê ku fermana dardakirana Şêx Seîd û hevalên wî dide hene. Li gorî van belgeyan, dagîrkerên Tirk jî qebûl dikin ku serîhilda Şêx Seîd serîhildaneke netewî bûye û ji bo Kurdistanêke serbixwe ev serîhildan hatiye pêkanîn. Pirtûk 122 rûpel e. Di berga pêşîn ya pirtûkê de wêneya Şêx Seîdê nemir heye.

**DI SIYASET Ü WÊJEYA KURDÎ  
DE DÎTINÊN MONOLOTÎK,  
OTORÎTER Ü TENGIYÊN HIZIRÎ**  
**Amadekar : M. Yilmaz**  
**Weşanên Jîndan**

Ev pirtûk pirtûka hevpeyvînan e. Di pirtûkê de bi İbrahîm Guçlu, Mehdi Zana, Eshat Ayata, Sîrac Bîlgîn û Erîk Ostling re hevpeyvînen ku hatine çekirin hene. M. Yilmaz bi wan kesan re hevpeyvînan çekirîye û paşê van hevpeyvînan civandîye ser hev û wek pirtûk weşandiye.

Nivîskar û wergervanê Kurd Eshat Ayata ji bo pirtûkê pêşgotineke bi zimanê Swêdî nivîsiye. Di berga dawî ya pirtûkê de jî bi Swêdî kurtenivîseke Peter Erîkson heye. Hevpeyvîn hemû bi Kurdî ne. Herdu nivîsên bi Swêdî jî, bi gotinên balkêş hatine xemilandin. Xweziya amadekarê pirtûkê van herdu nivîsên Swêdî jî wergerandana Kurdî.

Hevpeyvînen ku di vê pirtûkê de ne bi her awayî girîng in, dîtinêni balkêş têde hene. Di hevpeyvîna ku bi Esat Ayata re hatiye çekirin de, li ser kovara Vate(ev kovar bi zaravayê Zazakî tê weşandin) rexneyen balkêş hene. İbrahîm Guçlu jî pirsa demokrasiyê bi berfirehî qal kiriye.

Di alî dawiya pirtûkê de navên çend nivîskaran hatiye nivîsin û paşê jî çend berhemên nivîskaran hatiye nivîsin. Çima hatiye nivîsin, ev jî diyar nîn e. Tu eleqeya vê pirtûkê û navê nivîskaran û çend berhemên wan bi hevûdu re tune ye. Çima hatiye nivîsin?

**Kovara Rastî**

Kovara Rastî kovareke siyasî û şîroveyî ye. Du hejmarêni wê derketine. Xwediye kovarê Komela Gulani e. Kovar li Stockholmê (Swêd) derdikeye. Berpirsiyare giştî jî Dara Bilek e. Redaksiyona kovara Rastî ji van kesan pêk hatiye: Cemal Batun, Dara Bilek, Nasrat Haci, Dr. Alan Silo û Dr. Elî Huseyn e.

Di hejmara duyem ya kovara Rastî de ev nivîs hene:

Di destpêkê de pêşgotineke heye. Di vê pêşgotinê de li ser revandina Şemdîn Sakik hatiye seknandin. Sernavê nivîsê "Bûyera Revandina Şemdîn û Helwesta Rastî'ye" ye. Di vê nivîsa şirove de, bûyera revandina Şemdîn Sakik li gorî dîtina PDKa başûr -dîtina fermî- hatiye nirxandin.

# Rastî

Nivîsa yekemîn a vê hejmara nivîsa rehmetî Orhan Kotan e. Ev nivîs nivîsa dawîn ya Orhan Kotan e ku di kovarên Kurdî de tê weşandin. Kovara Rastî hejmara duyem hêj di çapxaneyê de bû, Orhan Kotan çû ser heqîya xwe, wefat kir e. Sernavê nivîsa Orhan Kotan "Li Pêş Berpirsiyariyên Dîrokî" ye. Orhan di vê nivîsa xwe de rexne li PKKê digre û PDKê diparêze. Fewzî Ertûşî li ser semînereke ku rewşenbîrên Kurd, Alman û Tirk besdar bûne radiweste. Cemal Batun li ser "Konseptên Siyasi û Tevgera Kurd" nivîsiye. Nivîseke balkêş e û têde rastîya konsepta siyasi û tevgera Kurd hatiye zimên. Selîm G. Li ser "Rojnamegeriya Kurd li Bakûrê Kurdistanê" lêkolîn çêkiriye û agahdarî daye xwendevanan. Nasrat Hacî li ser rojnamevanîya Kurdî li Kurdistanâ Iraqê sekiniye. Dr. Alan Haco jî nivîseke balkêş nivîsiye û li ser "Nexweşîya Partîperestîyê" sekiniye. Dr. Elî Huseyn li ser nakokîyên 1964an yên di nav PDKê û tesîra wê ya li ser PDK-Îran sekiniye. Dara Bilek bi kurtî "Pêvajoya Dîrokî Ya Tevgera Kurd Li Bakurê Kurdistanê" nivîsiye. Rojhat Amedî jî li ser Kurdan û siyasetî dîtinên xwe nivîsiye. Nivîsa dawîn jî a Muhamed Dewran e. Navê sernivîsa wî "Ax Ziman, Ziman" e. Kovara Rastî 42 rûpel e û ji sê mehan careke derdikeve.

## Kovara WAR

Kovara War kovareke demsalî ye. Ev çar hejmara ku bi rêk û pêk di dema xwe de derdikeve. War kovara lêkolîn û lêgerînê ye. Her çar hejmarên wê jî ji alî naveroka xwe ve dewlemend e. Gelek nivîsên baş û hêja yêñ lêkolînî di kovara War de têne weşandin.

Kovara War bi du zimanan bi Tirkî û Kurdî(zaravayê Kurmancî û Zazakî) derdikeve. Di vê hejmara çaran de nivîsên Kurdî hîn zêdetir in. Di hejmara 4an a kovara Warê de ev nivîs hene: Martîn Van Bruinessen li ser Hacî Bektaş nivîsiye û ev nivîsa wî wergerandine Tirkî. Ramazan Alan li ser rexneyê bi tirkî nivîsiye. Bengîn Amedî bi Tirkî li ser leyistikên Kurdî û Şanoyê şirove kiriye. M. Gunes ji bo pêngava avakirina bîbîlyografiya Kurdî bangek kiriye. Prof. Maruf Xeznedar "Zembîfiroşa Feqîyê Teyran" nirxandîye. Lokman Polat romana Mehmed Uzun "Mirina Kalê Rind" analîz kiriye. Abdurrahman Uçaman li ser "İnsan û Dîn - Mirov û ol" sekiniye. Mikaîl Canpolat li ser jiyanâ "Hacî Qadirê Koyî" nivîsiye. Kalêciwan jî li ser bîranîna Mela Ebdirehmanê Licî nivîsiye. Ferhenga Kurmancî, Hewramî, Dimilî, Senendejî di vê hejmara de jî didome.

Kovara War li Stenbolê derdikeve. Xwedîyê kovarê li ser navê weşanên Kor, Kamber Soypak e. Ev hejmara kovara Warê 168 rûpel e.



Hacı Bektaş Hâia Sultan Sahak İken

Maro von BRAUN SSSEN Tunç - Arşîp KAHATAS

Metin, Beklenîter ve Eleştiri

Reşatcan ALAN

Kurt Seyîlik Oyunları ve Tiyatro

Bengîn AMEDİ

Kurt Bibliyografyası Bir Çağrı ve

Mütevazi Bir Adam

M. GÜNEŞ

Zembîfiroşa Feqîyê Teyran

Prof. Maruf XEZNEDAR

Hunerî Nêxa û Kolana Kurdi

Kurdî Tevgera Muhîd SAÖN

Kâle Rind

Lokman POLAT

İnsan û Dîn

Abdurrahman UÇAMAN

Seyîdayê Heja Mela Ebdirehmanê Liceyi

Baydalbayê Kurdan bû

KALECİWAN

FERHENG-VÂJİNAME:

Kurmandî-Hewremî-Oerdi-Serendî

Azizullahîn UÇAMAN (Sezi VERDÜ)

Li Ser Salvegera 100 Sallya

Rojhamegerlerya Kurdi Çend Gotin

WAR

Haci Qadî Koyî

Mihai Çarpas

Vatay Verînan; Vatay Ceribnayey û

Şirêta Kal û Pirandî Ma

## Weşanên Nû

**Ji Nav Weşanên Nûdem**

## HAWAR

Dengê Zanînê

Derket!

Bixwînin! Bidin Xwendin!

Xwe bi Hawarê serbilind bikin, mala xwe pê şen  
bikin, giyanê xwe pê şa bikin!

---

**Ji Nav Weşanên Helwest - Çanda Nûjen**

**EY ŞEHİD, HEY HEBÛN**

Lokman Polat

**JI NAV EDEBIYATA SWÊDÊ**

Lokman Polat

**HESPÊ BOZ Ü ŞÊXZADE**


Lokman Polat

Bixwînin! Bidin Xwendin!

..... HELWEST .....

**Kovara Çandı, Edebi Ü Rexneyî**

**Hejmar / No : 11 – Sal / Year - Payiz - 1998**



**ISSN - 1400 - 9404**

**Helwest - Çanda Nüjen**

**Helwest - Analiz # Kultur # Literatur**